# Ji Cemaeta Gulen bayê bêbextiyê

SAZIYÊN ragihandinê yên bi ser cemaeta Gulen ve pêla derewan û bêbextiyê ya li hemberî gelê kurd derxist asta herî bilind. Derewa dawî ew e ku Komeleya Piştgiriyê ya Jiyana Hemdem (ÇYDD) bursê dide PKK'iyan. Lê zêde dom nekir, derewa wan zû aşkera bû. Ligel aşkerabûna vê derewê xwediyên derewê daketin asta bêbextan. Ango bûn 'mûfterî'. Însiyatîfa Gel a Kurdistanê pêr Cemaeta Gulen hişyar kiribû.

RAYEDARÊN PKK'ê ku ji ajansa nûçeyan ANF'ê re axivîn, diyar kirin ku cemaeta Gulen bi weşanên nijadperest kurdan wekî hedef nîşan didin. Rayedaran destnîşan kir ku cemaeta Gulen kirinên JÎTEM'ê yên li hemberî kurdan rewa dike û wiha dibêjin: "PKK'iyekî ku ÇYDD bûrsê dide nîn e. Em faaliyetên ÇYDD'ê yên li Kurdistanê ji destpêkê heta niha wekî hewldanên asîmîlasyonê dibînin û dinirxînin."... RÛPEL - 5



## Dixwazin îradeya azad bifetisînin

Ev hefteyeke em êrîş û operasyonên li hemberî DTP'ê dijîn. Ji bo ku ev operasyon baş bê fêmkirin divê paşeroja wê jî bê bibîrxistin. Roja Operasyon pêk hatî Başbûg konsepta siyaseta dewleta tirk a ji bo dema pêş vedigot. Jihevcudakirina 'kurd' û 'zaza' bilêv kiribû. Ev konsept bermayiya polîtîkaya Sedam e. Têkiliya vê konseptê û biryara qedexekirina zaravaya kurmancî li Başûr jî, heye. Bi armanca fetisandina îradeya azadîxwaz a gelê kurd tevnek hatiye raçandin... Nivîsa Adil ZOZANÎ R.2

ROJEV

20 Nîsan - Duşem 2009 Buha: 50 Kr Hejmar: 5

21 sazî û rêxistinên çepgir û demokratîk ji bo piştgiriya DTP'ê bikin li ber avahiya Navenda Giştî ya DTP'ê çalakiya rûniştinê pêk anî. Nûnerên saziyan xwestin ku zordariya mezin a li ser DTP'ê bê rawestandin

# Nobedariya biratiyê

### ZILM Û ZORDARIYÊ RAWESTÎNIN

Rêxistinên û saziyên çepgir û demokratîk ên li Tirkiyeyê piştgirî da DTP'ê û ji Hikûmeta AKP'ê xwestin ku serdagirtin û êrîşên li dijî DTP'ê demildest rawestînin. 21 rêxistinên civakî bi armanca piştgiriyê li ber Navenda Giştî ya DTP'ê daxuyaniyek dan çapemeniyê. Nûnerên rêxistinan li ber avahiya DTP'ê çalakiya rûniştinê li dar xist û dan zanîn ku heta zext ranewestin çalakiyên wan dê bidomin.

### VÎNA GEL TUNE DIHESIBÎNIN

Li ber avahiyê Cîgira Serokê Koma DTP'ê Fatma Kurtulan diyar kir ku bi êrîşa li ser wan aştî wekî hedef atiye girtin. Li ser navê saziyan Ruşen Sumbuloglu jî diyar kir ku DTP ji bo aştiyê şansek e û lazim e û wiha got: "Pergal bi destê AKP'ê encama hilbijartinê îtîraz dike. Vîna gel tune dihesibîne. Her kes dizane ku Hikûmeta AKP'ê dixwaze bi van operasyonan tola xwe ji vîna kurdan bistîne û serî li riyên antîdemokratîk dide."

### SAZIYÊN PIŞTGIRÎ DAN EV IN:

EMEP, EHP, SDP, Partiya Sosyalîst, TKP, ODP, ESP, Malên Gel a Enqere, Federasyona 78'an a Şoreşger, Anti-Kapîtalist, Federasyona Gelên Demokratîk, Federasyona Komeleyên Elewî û Bektaşiyan, Komeleya Çandê ya Pîr Sûltan Abdal, Platforma Şaxan a KESK'ê, Nûnertiya Herêma Enqereyê ya DÎSK'ê, Tum-ÎGD, Navenda Çandê ya Mûstafa Suphî, Ciwantiya nû ya Demokratîk, Şanoya Azad... RÛPEL - 4




## Bi doçkayê înfaz kirin

Li bajarê rojhilatê Kurdistanê Xoyê hêzên dewleta Îranê ciwanê kurd ê 25 salî Elî Îbrahimlu qetil kir. Her wiha li nêzî sînor li gundê Doletû esnafê kurd ê bi navê Kamal Şinoyî ku ji Zewyê ya bi ser Pîraşarê ye ji aliyê hêzên dewletê ve hate qetilkirin. Hate hînbûn ku di êrîşê de çeka doçkayê hatiye bikaranîn û ji ber wê yekê cesedê Şinoyî parçe bûye. Hate hînbûn ku dema Şinoyî xwestiye sînor derbas bike hatiye qetilkirin... RÛPEL - 3

## Ji daraza tirk rûreşiyeke din

Dozgeriya Komarê ya Geverê der barê serlêdana Baroya Colemêrgê ya ji bo pirsiyarkirina bûyerên di Newroza 2008'an de derketî biryara neşopandinê da. Di encama bûyerên li ser mudaxeleya polîsan dest pê kirin û hefteyekê dom kirin de Îkbal Yaşar û Fahrettîn Şendal bi guleyan polîsan hatibûn kuştin. Parêzeran daxuyand ku dozgeriyê bêyî tu lêkolînê bike biryara neşopandinê daye û xwest biryar paşve bê kişandin... RÛPEL - 3

Dema ku dewlet şaş bibe Nivîsa Ahmet DERE R.6

Ba her dem ne li gorî kelekvan e Nivîsa Dildarê AMEDÊ R.2

## Ahmet Turk xelata Feqî Sagniç wergirt



5'emîn Xelata Zimanê Kurdî ya ku ji aliyê Enstîtuya Kurdî ve her sal tê dayîn, îsal hêjayî hevserokê DTP'ê Ahmet Turk dîtin. Di 17'emîn avakirina Enstîtuya Kurdî de ji bo bîranîna Feqe Huseyîn Sagniç resepsiyonek hate dayîn. Hevserokê DTP'ê Ahmet Turk xelata xwe ji destê hevsera Feqe Huseyîn Sagniç, Rabîa Sagniç girt. Turk diyar kir ku hunermend û wêjevanan ji bo ku ziman û çanda kurd geş bibe gelek xebatên girîng meşandine û ev xebatên niha berdewamiya xebatên wê demê ne... RÛPEL - 9

## Pedagojiya bi kurdî

Şewirmendê Psîkolojiyê Ramazan Pertev yekemîn 'Pirtûka Zarok û Çîrok Despêka Pedagojiya Kurdî' ku têkildarî pedagojiyê agahiyan dide bi panelekê da nasandin. Ramazan Pertev diyar kir ku pedagojî zanista mezinkirina zarokan e... RÛPEL - 9

## Riyên welatê min

Rê, cih û mekanên seretayî ne ku em xwe û hevûdin lê nas dikin. Tenê bila em biryarê bidin ku carekê bimeşin û dest bi wê gava yekemîn bikin. Tenê bila em biwêrin li rê binêrin. Em, ji mekanê em lê ne, veqetandinê xeyal bikin... RÛPEL - 10



Ev hefteyek e em êrîş û operasyonên li hemberî DTP'ê dijîn. Dijîn lewre ev operasyon bi tenê li hemberî DTP'ê nîn e. Rastî ew e ku yekî ku bêje 'ez kurd im' ji vê operasyonê bêpar nîn e.

Ango mesele ew qas kûr û dûr e.

Ewilê 14'ê nîsanê bînin bîra xwe. Wê rojê çi çêbû? Operasyona li hemberî DTP'ê piraniya wan bajarên Kurdistanê li 15 bajaran dest pê kir. Heta duh jî vê operasyonê dom kir. Ligel ku reqemeke tekûz nîn e, herî kêm 245 DTP'î hatin binçavkirin. Ji sedî zêdetirî DTP'î hatin girtin. Lê ev bi tenê aliyekî 14'ê nîsanê ye.

Aliyê din ê girîng axaftina Îlker Başbûg bû. Aliyekî axaftina wî sedemê operasyona li hemberî DTP'ê vedigot: 'Divê em fersenda ji bo baweriya serkeftinê bi rêxistina 'terorîst' û alîgirên wê nedin jiyîn'. Kurdekî ku vê peyamê fêm neke, divê korefêmî be. Peyam zelal bû.

Lê ligel vê peyama ji bo operasyonê lîteratûr û 'hazîrûna'-kesên beşdarbûyîn- civîna Başbûg jî girîng bû. Ji lîberalan heta nijadperestan hemû aliyên tirk di vê civînê de amade bûn. Ev peyam jî zelal bû. Bi serkêşiya Artêşa Tirk eniya li ser esasê dakişandina jêr a daxwazên gelê kurd ava bû. Ji kesên beşdarî vê civînê bûn, heta niha dengekî cihe derneketiye. Her kesekê tevlî civînê bûyî 'bejna' xwe li ber konsepta artêşê tewand.

Hevokeke Îlker Başbûg hebû ku, teşeyê siyaseta dewleta tirk a ji bo pêşerojê vedibêje. Îlker Başbûg ligel ku hebûna gelê kurd 'nasdike' îşareta polîtîkayeke nû ya parçekirina kurdan da.

Hevoka Başbûg a ku peyama ji bo polîtîkaya pêşerojê vedibêje ev e: 'Di têkoşîna me ya li hemberî 'rêxistina terorîst' de gelek ewladên me yên ku bi eslê xwe ***kurd*** û ***zaza*** ne, gihîştine asta 'şehîdî' û 'gazîtiyê' hene.

Ji hev cudakirina 'kurd' û 'zaza'yan beriya niha di belgeyên AKP'ê yên ji bo hilbijartinê de derketi bû pêşberî me. Ji ber ku beriya hilbijartinê ev jihevcudakirin hatibû rojevê zêde kes li ser nesekinî. Lê niha em rûbirû tabloyeke nûn e. Başbûg ev jihevcudakirin piştî 'cesaret' ji encamên hilbijartinê girtin lêv kir. Dewleta tirk di siyaseta xwe ya ji bo pêşerojê de Serhedê wekî nermahiya zik a siyaseta kurd dinirxîne.

Bizmar



ADIL ZOZANÎ
a_zozani@hotmail.com

# Hedef fetisandina hişmendiya azadîxwaz e

Lê paşroja vê polîtîkayê jî heye. Ji bo ku ev jihevcudakirina kurdan ku bi zaraveyan ji hev cudabûne bêne, bêfêmkirin divê destpêka salên 70'yan û başûrê Kurdistanê bînin ber çavên xwe.

Hikûmeta Sedam di wê serdemê de perwerdehiya bi zaraveyê soranî serbest kir û zaraveyê kurmancî qedexe kir. Di gelek çavkaniyên dîrokî de tê bibîrxistin ku piştî hevdîtinên di navbera Tirkiye û Iraqê de Sedam ev biryar girtibû.

Hefteya borî nûçeyekê ku di nava hengameya operasyonê de winda bûyî hebû. Hikûmeta Herêma Federal a Kurdistanê perwerdehiya bi zaraveyê soranî li ser herêma Behdînan jî ferz kir û perwerdehiya bi zaraveyê kurmancî qedexe kir.

Niha em ji xwe bipirsin, di serî de Barzanî, behdîniyan çima zaraveyê xwe li xwe qedexe kir? Ji hezkirin û pêşketîtirîna zaraveyê soronî ye gelo? Na, lewre dinya-alem dizane ku kurmancî zaraveyê herî berfireh ê zimanê kurdî ye. Wê demê sedem çi ye?

Wisa dixuyê ku di vê mijarê de tazîka dewleta tirk heye. Biryara Parlamentoya Herêma Kurdistanê tavîzeke li hemberî tazîka dewleta tirk e. Gelek sedemên vê tazîkê hene. Lê ez yekê bitenê bi bîr bînim: Heke li Başûr zaraveyê kurmancî bibe zimanê perwerdehiyê dê têkiliya ramyarî ya di navbera Bakur û Başûr de xurttir bibe. Dewleta tirk vê yekê naxwaze.

Jihevcudariya Başbûg a ji bo 'zaza' û 'kurdan' dewama vê ferasetê ye.

Dema mirov qedexekirina zaraveyê kurmancî ya li Başûr û siyaseta dewleta tirk a ji bo jihevcudakirina kurdan datîne ber hev, lihevkirineke 'zimnî' derdikeve holê.

Dewleta tirk bi vê polîtîkayê dixwaze pêla azadîxwaz a gelê kurd di herêmekê –Behdînana Jorîn, Botan û Amed- bifetisîne.

Biryara Parlamentoya Herêma Federal a Kurdistanê jî, mixabin xizmetî vê polîtîkayê dike.

Lê ligel Başûr em kurdên Bakur jî bi 'tiraliya' xwe rê li ber vê polîtîkayê vedikin. Beriya dor bigehije gotinên Başbûg divê li hemberî polîtîkaya jihevcudakirina kurdan divê xebatên me hebûna.

Îlker Başbûg piştî encamên hilbijartina 29'ê Adarê ev nirxandin kiriye. Lê polîtîkayeke ji gotinên Başbûg destpêdike nîn e. Di 9'ê hezîrana 2004'an de dewleta tirk gava herî şênber a ji bo vê polîtîkayê avet. Di TRT'ê de weşana bi kurmancî û zazakî parçeyekî vê konseptê dabû destpêkirin. Ji ber ku em bi piranî polîtîkayê bi hestiyarî dixwînin, dek û dolabên dijberên xwe nabînin.

Mînak, heta niha bitenê li Amedê 4 konferans hatin lidarxistin. Mijarên wan standartkirina zimanê kurdî bû. Di konferansa herî dawî de biryareke wisa derket: **Zaraveyên kurdî ji bo pêşeroja zimanê kurdî çavkaniyên dewlemendiyê ne û divê bêne parastin.**

Lê ev biryar di konferansê de ma. Hişmendiyeke xurt a di vê çarçoveyê de nehate avakirin. Rewşenbîrên kurd ev mijar, negirt rojeva xwe û di vê çarçoveyê de hişyariyên ji bo pêşerojê nekirin.

Îro, ew roj e ku em 'tepan li serê xwe bixin'.

Heta niha rewşenbîran gelek rexneyên erzan li siyasetê kirine. Ji 'felan kes çima bi kurdî naaxive' wêdetir rexneyên jiyanber nehatin kirin. Herî zêde jî di vî warî de DTP hate rexnekirin. Lê kesekî ku rabe polîtîkaya DTP'ê ya ji bo Serhedê rexne bike derneket. DTP çima li Serhedê qels e? Ne hate pirsîn. Tabloya piştî hilbijartinê li Kurdistanê derketiya holê li baskê Serhedê destûpiyên DTP'ê girêdan. Bifikirin ku îro şaredariyên Mûş û Çewlikê jî di destê siyaseta kurd de bûna dê tablo cihetir bûya. Başbûg nedikarî jihevcudakirina 'kurd' û 'zaza' wekî perspektîfa esasî ya siyasî dane ber dewleta tirk.

Rewşenbîrên kurd divê vê rexneyê bigirin ser xwe. Mînak çima li hemberî –bêguman ên rexne dikin hene- qedexekirina zaraveyê kurmancî bêdengî heye? Her wiha ji bo ku siyaseta kurd li bakurê Kurdistanê qadên xeternak li ser dewletê vekirî nehêlin rewşenbîr xwedî hişmendiyeke çawa ne?

Piştî hilbijartinê, bitenê di nivîsa Edîtor a Azadiya Welet de –ku li ser encamên hilbijartinê bû- kêmasiya bidestnexistina Serhedê nehate rexnekirin. Ev rexne –hişyarî- di Azadiya Welat de hate kirin.

Ligel operasyon û êrîşên li hemberî DTP'ê dane destpêkirin, dirindeyê di hundirê neyaran de careke din rûyê xwe nîşanî me hemûyan da. Îro dîsa hestên me germ bûne. Lê sibê em ê dîsa vê xetereyê ji bîr bikin. Lewre, neyarê ku îro êrîş dike dê sibê tiştekî din ê ji bo destnîşankirina rojeva me dane holê. Em ê rojevên ku neyaran destnîşankirine nîqaş bikin. Neyar dê tevnê xwe raçîne.

Mînak biryara Sedam a di destpêka salên 70'ê de bi hevkariya Tirkiyeyê girtiye, piştî 38 salan li Başûr rûyê xwe yê esasî nîşanî me da. Lê heta vê polîtîkayê encam neda, nebû rojeva me.

Îro jî hewldanên ji bo dorpêçkirina kurdên azadîxwaz di rojevê de ye. Hişmendiya azadîxwaz di herêmekê de tê fetisandin.

Piştî ku DTP serkeftinên berbiçav di hilbijartinan de bi dest xistin û piştî ku KCK'ê biryara rawestandina şer îlan kir, bi kurtasî her ku tevgera kurd bixwaze rê li ber diyalogê vebe û pirsgirêka kurd ne bi şer lê bi riyên demokratîk û aştiyane çareser bibe rastî êrîş û saboteyên wiha tê



# Ba, her dem ne li gor dilê kelekvan e

**DILDARÊ AMEDÊ**

Wekî hûn dizanin di van rojên dawî de hêzên dewletê avêt ser gelek mal û saziyên kurdan û gelek siyasetmendarên kurd girtin binçav. Kesên ku rojevê dişopînin kêm zêde dizanin çima di vê demê de ev operasyon pêk hatin.

Di vê demê de yanî piştî ku DTP serkeftinên berbiçav di hilbijartinan de bi dest xistin û piştî ku KCK biryara rawestandin a şer îlan kir. Bi kurtasî her ku tevgera kurd bixwaze rê li ber diyalogê vebe û pirsgirêka kurd ne bi şer lê bi riyên demokratîk û aştiyane çareser bibe rastî êrîş û saboteyên wiha tê.

Di hemû dîroka nêz a hikûmetên tirk de sabote û têkbirina hewldanên ji bo çareseriyê bi riyên cuda hatine têkbirin û ew jî dide xuyakirin ku hin hêz hene ku ji vî şerî sûdê digirin û naxwazin ev şer raweste. Lê di vê demê de tiştê ku hatiye guhertin ew e ku êdî gelê kurd ne wek berê ye, bêtir bi hişyarî tevdigere û ji her demê bêtir xwedî li nirxên xwe derdikeve. Ew xwepêşandanên ku duh li gelek bajaran bi tevlîbûna bi sedhezaran hatin lidarxistin ji bo şermezarkirina vê operasyonê jî nîşaneyeke vê têghîştina gelê kurd e.

Hikûmet hemû hêz bi hemû sazî û dezgehên xwe tev di van hilbijartinan de bûn yek da ku îradeya kurdan têk bibin û AKP wekî nûnerê gelê kurd jî nîşan bidin. Armanc ew bû ku li bajarên kurdan AKP bi ser bikeve û wê gavê xwe li her deverê wekî ku ew temsîla kurdan dike bide nîşandan.

Lê wekî ku dibêjin her dem ba li gor dilê kelekvanan hilnayê û li gor berê kelek û gemiya wî hilnayê. Bayê van hilbijartinên dawî jî li gor dilê AKP'ê hilnehat û gemiya hêviyên wê noqî binê avê bû. Bayê van hilbijartinan li gor dilê DTP'ê hilat û gemiya wê bi silametî gihande peravê.

Hikûmet jî dikarîbû ku wê serkeftina DTP'ê wekî şensekî ji bo çareseriya pirsgirêka kurd binirxîne lê berevajî vê yekê ji berê bêtir çû bi ser DTP'ê de û ev operasyona dawî ya li dijî DTP'ê wekî çavsorî û çavnebariya encamên hilbijartinan tê nirxandin û ji aliyekî din ve jî israra di riya bêçareseriyê de ye.

Ew endam û berpirsiyarên DTP'ê û saziyên din ên kurdan ku hatin binçavkirin û girtin ji berê ve nav û navnîşanên wan aşkara bûn, ji berê ve tawambariyên wan aşkara bûn gelo çima heta niha nedihatin girtin. Ya rast jixwe her kesê ku bêje ez kurd im an jî têkiliya wan bi tevgera kurdan re heye jixwe bi dehan bêbextî û tewambarî li ba dezgehên ewlekariya dewletê amade ne. Madem tu kurd î ev yek bes e ku tu tawambar bî û bi sedên behaneyan ji bo tawambarkirina te li ser refikên wan li hêviya te ne.

Kurd gelek caran bi êrîşên wiha çavsor re rû bi rû mane û gelek caran êrîşên ji van xedartir û hovanetir jî dane meşandin lê di encamê de li şûna ku kurd bitirsin an jî gavekê bi paş de bavêjin, wan her dem bi berxwedana xwe ev hewldanên wiha, pûç kirine.

Ez bawer im ku dê tevgera kurd vê komploya çavnebarî û çavsoriyê jî wekî hewldanên berê yên hikûmeta AKP'ê pûç derxîne û li gorî vê pêvajoyê xwe ji nû ve birêxistin bike.



Rupel 3+++++:Layout 1 19.04.2009 15:58 Page 1



# Dozger hewcedarî pirsyarkirina kujeran nedît

Dozgeriya Komarê ya Geverê der barê serlêdana Baroya Colemêrgê ya ji bo pirsiyarkirina bûyerên di Newroza 2008'an de derketî kirî de biryara neşopandinê da. Di bûyeran de Îkbal Yaşar û Fahrettîn Şendal bi guleyên polîsan hatibûn kuştin.

Midûriyeta Polîsan a Geverê di sala 2008'an de destûr nedabû Newroza di 24'ê adarê dê bihata pîrozkirin. Girseya ji bo pîrozbahiya Newrozê li ber DTP'a Geverê kombûyî rastî mudaxaleya polîsan a bi panzer, bombeyên gazê û guleyan hatibû. Di encama bûyerên li ser mudaxeleya polîsan dest pê kirîn û hefteyekê dom kirîn de Îkbal Yaşar û Fahrettîn Şendal jiyana xwe ji dest dabûn. Di bûyeran de bi sedan kes jî birîndar bibûn, 100 kes hatibûn binçavkirin û ji wan 20 jî hatibûn girtin. Di serdagirtinên malan ên piştî bûyeran de li gelek malan ziyana madî pêk hatibû.

Li ser kuştina 2 kesan û ziyana hatî dayîn Baroya Colemêrgê ji bo pirsiyarkirina berpirsyaran serî li Dozgeriya Komarê ya Geverê dabû. Baroyê xwestibû ku berpirsyar bên tespît kirin û darizandin. Lê Dozgeriya Komarê ya Geverê piştî salek di ser bûyerê re derbas bû, bersiv da baroyê. Dozgeriyê di bersivê de diyar dike ku hewceyî bi lêkolîn û pirsiyarkirina bûyerê nedîtiye. Ji parêzeran Davut Uzunkopru, Kutbettîn Bayatiz, Erdal Aydin, Ferîdun Guler, Necîp Korkmaz piştî biryara dozgeriyê li Dadgeha Cezayên Giran a Wanê îtîraz kir. Parêzeran xwest ku dozgeriyê bêyî tu lêkolînê bike biryara neşopandinê daye û xwest biryar paşve bê kişandin. **COLEMÊRG**

# Êrîşên faşîstan didomin

## Li Zanîngeha 18'ê Adarê ya Çanakkaleyê êrîşên xwendekarên nijadperest yên li hemberî xwendekarên kurd didomin. Li zanîngehê, di pêvajoya azmûnan de xwendekar rastî êrîşên nijadperest tên

Li Navenda Çandê ya Troya ya Kampûsa Terzîoglu ya Zanîngeha Çanakkaleyê, aloziyên piştî bernameyek televîzyonê ya di 18'ê adarê de bi beşdariya xwendekaran pêk hatî, dest pê kirîn, berdewam dikin.

Xwendekarên demokrat ku beşdarî bernameyê bûbûn rastî gefên xwendekarên nijadperest hatibûn. Piştî nîqaşê xwendekarê kurd yê bi navê Îkram Kara ku di pola 2'emîn a Beşa Fîzîkê de dixwîne dema diçû mala xwe, rastî êrîşa komek xwendekarên nijadparest hat. Piştî Kara li Midûriyeta Polîsan Çanakkaleyê îfade da dîsa ji aliyê heman xwendekaran ve rastî êrîşên çekdarî û kêr hat. Di bûyerê de 14 xwendekarên kurd hatin binçavkirin û şevek li qereqolê derbas kirin. Piştî bûyeran Rektoriya zanîngehê der barê 24 xwendekaran de lêpirsîn da destpêkirin. Rektoriyê bi hinceta hevalê Kara li Kara dane xwest îfadeyê bidin.



Piştî êrîşa li ser Îkram Kara, li ser xwendekarê Beşa Mîmariyê Akin Eşer jî pêk hat. Eşer dema ji yurdê diçû zanîngehê ji aliyê heman komê ve rastî êrîşê hat. Koma ku bi dar û kêran êrîş kir, Eşer bi gelek cihan birîndar kir. Eşer'ê rakirin nexweşxaneyê 10 rojan rapora karnedîtinê girt. Lê belê ji ber vê yekê kes nehat binçavkirin. Li ser bûyeran Xwendekarên demokrat bi rêveberiya Zankoya Fen-Edebiyatê re hevdîtin çêkirin û xwestin lêpirsînê dest pê bikin.

Xwendekarên hevdîtin çêkirin piştî derketina derveyî Zankoyê dîsa rastî êrîşa heman koma xwendekarên nijadperest hatin. Di êrîşê de xwendekarên demokrat kêrek ji xwendekarên nijadperest girtin û radestî yekîneyên ewlehiya Zanîngehê kir, lê belê piştre ew kêr ji aliyê yekîneya ewlehiya zanîngehê ve hate windakirin.

**Hem êrîş hem jî lêpirsînan**

Piştî bûyeran li şuna ku li xwendekarên nijadperest lêpirsîn bê vekirin zêdetir li xwendekarên demokrat ku mexdûrê êrîşan in tê vekirin. Rektorî û cenderme li gelek xwendekarên demokrat ku rastî êrîşan hatibû lêpirsîn vekir. Cendermeyan li nava zanîngehê îfadeyê xwendekarên demokrat girt. Li ser bûyeran Rektorê Zanîngehê Alî Akdemîr, bi xwendekarên demokrat re hevdîtin çêkir û ji bo bûyer bi dawî bibin nêrînên wan girt. Xwendekarên demokrat hevdîtina bi rektoriyê re erênî dîtin û diyar kirin ku ji ber ewlehiya zanîngehê, rayedarên midûriyeta bajar û rêveberiya zanîngehê li hemberî van êrîşan tedbîran nagirin.

Di pêvajoya hevdîtina Rektoriya Zanîngehê de xwendekarê bi navê Engîn Baz rastî êrîşa xwendekarên nijadperest hat. Dema Baz ji bo azmûnê çû polê, ji aliyê 10 xwendekarên nijadperest ve bi darê zorê ji polê hate derxistin. Li ser bûyerê Cîgirê Sekreterê Giştî yê Zanîngehê Îdrîs Yilmaz, ji xwendekaran re got, "Wekî ku hinek dixwazin li zanîngehê bûyeran derxin. Hûn jî miqate bin. Ger ku pêwist be ji malên xwe dernekevin." Li ser vê gotina Cîgirê Sekreterê Zanîngehe Îdrîs Yilmaz xwendekarên demokrat bertek nîşan dan û xwest ku rayedarên zanîngehê ewlehiya canê wan bigirin û êrîşkaran ceza bikin. Li ser bûyeran malbata xwendekar Îkram Kara bi hinceta ewlehiya canê wî tune ew birin malê. **ÇANAKKALE**

# Dewleta Îranê kurdan qetil dike

Li bajarê rojhilatê Kurdistanê Xoyê hêzên dewleta Îranê ciwanê kurd yê 25 salî qetil kirin û esnafê bi navê Kemal Şinoyî jî bi çeka balafirşikênê kuştin. Li gorî agahiyên hatin bidestxistin li herêma Kutul a bi ser bajarê Xoyê, ciwanê kurd ê bi navê Elî Îbrahimlu yê 25 salî kete kemîna leşkerên Îranê û hate qetilkirin. Hate hînbûn ku ev bûyer li gundê Revyan pêk hatiye. Ciwanê hate qetilkirin pêr hate definkirin û bi hezaran kes beşdarî merasîma cenaze bûn. Di vê navberê de li nêzî sînor li gundê Doletû esnafê kurd ê bi navê Kamal Şînoyî ku ji Zewyê ya bi ser Pîraşarê ye ji aliyê hêzên dewletê ve hate qetilkirin. Hate hînbûn ku di êrîşê de çeka balafirşikên ya mîna 'doçka' tê binavkirin hatiye bikaranîn û ji ber wê yekê cesedê Şînoyî parçe bûye. Hate hînbûn ku dema Şînoyî xwestiye sînor derbas bike hatiye qetilkirin, hesp û kerên wî jî hatine kuştin. Di 9'ê nîsanê de kesê bi navê Siddik Denîz bi îdiaya qaçaxiya mazotê kiriye ji aliyê hêzên Îranê ve hate qetilkirin. Di 4'ê nîsanê de jî Zubeyt Huseyn ê ji Xoyê bi heman îdiayê hate birîndarkirin. Dîsa esnafê bi navê Hîwa Esmayî li herêma di navbera Sine û Mêrîwanê de bû hedefa êrîşa hêzên Îranê û jiyana xwe ji dest da. **XOY / ANF**

# Bi sedan kes diçin konê sersaxiyê

Serdanên konê sersaxiyê yê gerîlayê HPG'ê Nasir Aydin ku di sala 2007'an de jiyana xwe ji dest dabû berdewam dikin. Ji bo cenazeyê gerîlayê HPG'ê Abdurrahman Arslan jî ji malbatê testa DNA'yê hate xwestin.

Gerîlayê HPG'ê Nasir Aydin di sala 2007'an de li çoltera navçeya Qilabana Şirnexê di pevçûnekê de jiyana xwe ji dest dabû. Piştî testa DNA'yê malbata Aydin hefteya borî cenazeyê xwe girtibû û li gundê Mûfê ya Gimgimê defin kiribû. Serdanên konê sersaxiyê yê ji bo Aydin hatiye vekirin jî berdewam dikin. Serokê DTP'a Mûşê Maşallah Yamaç, Serokê DTP'a Gimgimê Abdulbasît Taş, nûnerên rêxistinên civakî yên sivîl jî di nav de gelek kes çûn serdana konê sersaxiyê. Di serdanê de bênavber dirûşmên, "Şehîd Namirin", "Nasir rêhevalê Rojê ye" hatin berzkirin. Ji bo kesên jiyana xwe ji dest dayî rêz hate girtin. Dayika Aydin, Gulten Aydin di dema serdanê de diyar kir ku ew bi kurê xwe serbilind e. Aydin wiha got: "Êdî em naxwazin ne dayikên gerîla û ne jî yên leşkeran bigirîn. Ez dixwazim di nav welatekî aştî de bijîm. Ez aştiyê dixwazim."

**Testa DNA'yê hate xwestin**

Li aliyê din cenazeyê yek ji 5 HPG'iyên di 9'ê nîsanê de li herêma Besta ya Şirnexê di encama pevçûnê de jiyana xwe ji dest dan Abdurrahman Arslan, bi hinceta "Dê testa DNA'yê pêk bê" nedan malbata wî. Malbata Abdurrahman Arslan ku yek ji 5 HPG'iyên di 9'ê nîsanê de li herêma Bestayê di encama pevçûnê de jiyana xwe ji dest dan e, ji bo cenazeyê li goristana bajaroka Gundikê Melê ya bi ser Şirnexê hatiye definkirin bigire serî li Serdozgeriya Komarê ya Şirnexê da. Lê dozgeriyê bi hinceta ku heta testa DNA'yê pêk neyê dê cenaze nadin. Malbata Arslan pêşî bi Rêveberê DTP'a Şirnexê Abît Îke, Şaredarê Gundikê Melê Abdurrezak Yildiz û Serokê DTP'a Gundikê Melê Sabahatîn Yildiz re goristan ziyaret kir û piştre jî ji bo testa DNA'yê çû Nexweşxaneya Dewletê ya Şirnexê. **MÛŞ / ŞIRNEX**

# Li Pîranê kesek hate binçavkirin

Li navçeya Pîrana Amedê kesek hate binçavkirin. Li Kurdistanê binçavkirin û girtin her diçe zêde dibe.

Li gorî agahiyên ku hatine bidestxistin leşkerên Qereqola Cendirmeyan a Pîranê bi ser malan de girtiye. Hate zanîn ku di encama serdagirtinan de Ozan Bozkurt hatiye binçavkirin.

Sedema binçavkirina Bozkurt nehat zanîn. Bozkurt li Qereqola Cendirmeyan a Pîranê tê girtin. **AMED**

# Doz li nûçegihan hate vekirin

Der heqê nûçegihanê DÎHA'yê Vedat Yildiz de ku li navçeya Hezex a Şirnexê di dema çalakiyên ji bo şermezarkirina pêkanînên li dijî Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan de di encama mudaxeleya polîsan de rastî lêdanê hat û hate binçavkirin de bi îdiaya "Li ser navê rêxistinê sûc kiriye" doz hate vekirin.

Vedat Yildiz, li navçeya Hezex a Şirnexê di 20'ê cotmeha 2008'an de dema çalakiyên bi armanca şermezarkirina êrîşa fîzîkî ya li dijî Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan pêk hatî dişopand rastî şîdeta fîzîkî ya polîsan hatibû. Yildiz piştre hatibû binçavkirin û li Qereqola 5 Nîsanê rastî îşkenceyê hatibû. Îşkenceya ku li Yildiz hatibû kirin bi rapora bijîşk jî hatibû belgekirin.

Der heqê Vedat Yildiz ê li polîsan gilî kir, nûçegihanê AA û rojnameya herêmî ya Guney Expres Lokman Dayan de, li 4'emîn dadgeha Cezayê Giyar a Amedê bi hinceta muxalefeta li dijî zagona Hejmar 2911'an doz hate vekirin. Yildiz ku têkildarî doza hatiye vekirin nerazîbûn nîşan da, diyar kir ku roja bûyerê wekî nûçegihanekî peywira xwe pêk aniye û da zanîn rastî şîdeta polîsan hatiye. Yildiz, bal kişand ku doza der barê wan de hatiye vekirin bêtihemuliya li dijî azadiya çapemeniyê nîşan dide û destnîşan kir ku derheqê polîs û tîmên taybet ên êrîşî wan kirine de heta niha tu doz nehatiye vekirin. Yildiz, derbirî ku ev rewş mînaka pêkanîna dirû ya darazê ye.

Nûçegihanê AA'yê Lokman Dayan jî li dijî dozê nerazîbûn nîşan da û wiha axivî: "Wê rojê min jî wekî nûçegihanekî daxuyaniya çapemeniyê dişopand. Piştre hêzên ewlekariyê mudaxeleyî girseyê kirin. Tevî ku em endamê çapemeniyê bûn, êrîşî me jî kirin û em rastî lêdanê hatin. Li gel ku me derheqê polîsan gilî kir der heqê me de doz hate vekirin." **ŞIRNEX**



Vedat Yildiz

www.arsivakurd.org




# Li ber DTP'ê nobeta biratiyê

**Di nav de patiyên siyasî, sendîka û rêxistinên civakî jî heyî 21 saziyan li ber Navenda Giştî ya DTP'ê ji bo 7 saetan çalakiya rûniştinê pêk anî. Saziyan piştgirî da DTP'ê û got: Em hemû kurd in, em hemû DTP'î ne**

21 rêxistinên civakî bi armanca piştgiriyê li ber Navenda Giştî ya DTP'ê daxuyaniyek dan çapemeniyê. Nûnerên rêxistinan li ber avahiya DTP'ê çalakiya rûniştinê li dar xist. Wekîla Serokê Koma DTP'ê Fatma Kurtulan diyar kir ku bi êrîşa li ser wan aştî wekî hedef hatiye girtin. Li ser navê saziyan Ruşen Sumbuloglu jî diyar kir ku DTP ji bo aştiyê şansek e û lazim e ev şans bê nirxandin.

Nerazîbûnên li dijî operasyona li hemberî DTP'ê ku heta niha bûye sedema binçavkirina 250 kesî, 21 rêxistinên sivîl ên civakî li ber Navenda Giştî ya DTP'ê daxuyaniyek da çapemeniyê. Rêxistinên operasyon şermezar kirin li ber partiyê çalakiya rûniştinê pêk anîn. Li ber DTP'ê jî alên sazî û partiyên ji bo piştgiriyê hatine, hatin daliqandin. Her wiha pankarta, "Em hemû kurd in em hemû DTP'yî ne" ya li ser pateyê reş hatiye nivîsandin, bi avahiyê ve hate daliqandin. Serokê DTP'a Enqereyê Îsmaîl Anci diyar kir ku operasyona li hemberî DTP'ê binçavkirin û girtin gihiştine asta harbûnê. Anci ji bo piştgiriyê spasiya saziyên hatine serdana wan kir.

**'Kurdan rayedar tirsandin'**

Cîgira Serokê Koma DTP'ê Fatma Kurtulan jî spasiya saziyên piştgirî dane wan kir û wiha axivî: "Berî niha jî me gelek pirsgirêkên wiha jiyan. Lê ev operasyonek ji rêzê nîn e. Piştî hilbijartina daxuyaniya Berdevkê Hikûmetê Cemîl Çîçek, Serfermandariya Giştî nîşaneyên vê operasyonê bûn. Van encaman di serî de AKP û hemû rayedarên dewletê gelek tirsandin. Helwesta gelê kurd a ji bo aştî û demokrasiyê AKP tirsandiye. Ji ber vê yekê AKP'ê operasyona tolhildanê daye destpêkirin." Kurtulan, bal kişand ser modela rêxistinkirina partiyê û anî ziman ku ew bêtir rêxistinkirina berwarî ji xwe re esas digirin. Kurtulan, diyar kir ku ev jî modelek rêxistina meclîsê ye û wiha got: "Partiya me rêxistinkirina berwarî ji xwe re esas digire. Em helwest û feraseta ku rêgeza rêxistina meclîsê îlegal dide nîşan şermezar dikin. Rêxistinkirina ciwan û jinan bi rêgeza meclîsê xwe bi rêxistin dikin. Ev rêgez di rêziknameya me de jî cih digire. Kongreyên me jî li gorî rêgeza rêxistina ku em dipejirînin. Meclîsên me yên bajêr û navçeyan hene. Rêgeza rêxistinkirina me li ser demokrasiyê û tevlêbûna civakî tê avakirin."

Kurtulan, da zanîn ku rêgeza rêxistinkirina wan siyaseta li ser sûltaniyetê ava bûye dixe nava zorê û ji ber wê yekê ev rêgeza rêxistinkirina wan bûye hedefa êrîşan. Kurtulan, got ku ew vê modelê li her derê gav bi gav dixin jiyanê û wiha axivî: "Em jî endamê meclîsa jinan in. AKP vê yekê îlegal dike û kirasekî jê re difesilîne." Kurtulan êrîş şermezar kir û xwest di heman demê de hevalên wan ên hatine girtin serbest bêne berdan.

**'AKP vîna gel tune dike'**

Piştî Kurtulan Serokê Federasyona 78'an a Şoreşger Ruşen Sumbuloglu, diyar kir ku êrîş bi hilbijartinê ve girêdayî ne. Sumbuloglu, da zanîn ku beriya hilbijartina 29'ê adarê DTP ji niha ne cûdatir bû û wiha got: "Pergal bi destê AKP'ê encama hilbijartinê îtîraz dike. Vîna gel tune dihesibîne. Her kes dizane ku Hikûmeta AKP'ê dixwaze bi van operasyonan tola xwe ji vîna kurdan bistîne û serî li riyên antîdemokratîk dide." Sumbuloglû, destnîşan kir ku DTP ji bo çareseriya pirsgirêka kurd şansa dawî ye û axaftina xwe wiha dirêj kir: "DTP ji bo çareseriyê şansek e. Ligel hemû astengiyên AKP'ê gel dest ji vê vîna xwe bernade." Piştre Serokê Giştî yê KESK'ê Samî Evren û serokên Sendîkayên girêdayî KESK'ê jî piştgiriyên xwe yên ji bo DTP'ê anîn ziman.

**Saziyên piştgirî dan:**

EMEP, EHP, SDP, Partiya Sosyalîst, TKP, ODP, ESP, Malên Gel a Enqere, Federasyona 78'an a Şoreşger, Anti-Kapîtalîst, Federasyona Gelên Demokratîk, Federasyona Komeleyên Elewî û Bektaşiyan, Komeleya Çandê ya Pîr Sultan Abdal, Platforma Şaxan a KESK'ê, Nûnertiya Herêma Enqereyê ya DÎSK'ê, Tum-ÎGD, Navenda Çandê ya Mustafa Suphî, Ciwantiya nû ya Demokratîk, Şanoya Azad. **ENQERE / DÎHA**

# Li Wanê operasyon hate şermezarkirin

Li Wanê, bi armanca şermezarkirina operasyon û girtinên li hemberî DTP'ê bi daxuyanî hate dayîn û çalakiya rûniştinê hate lidarxistin.

Li Wanê Parlamenterê DTP'ê Ozdal Uçer, Şaredarê Wanê Bekîr Kaya, Serokê DTP'a Wanê Selîm Ertaş, Şaredara Bajaroka Sixkê Nezahat Erguneş, Şaredarê Qelqeliyê Murat Durmaz, endamên meclîsa şaredariyê û endamên meclîsa bajêr jî di nav de bi tevlêbûna sedan kesî bi armanca şermezarkirina operasyona li dijî DTP'ê daxuyanî hate dayîn. Girseya ku li ber avahiya DTP'a Bajêr hate cem hev bênavber sloganên, "Pêkûtî dê me bêzar nekin", "Silav silav ji Îmraliyê re hezar silav", "Tolhildan", "Bijî Serok Apo" hatin. Di dema meşê de Pankarta "Bi darbeya siyasî hûn nikarin me bêzar bikin" hate vekirin. Endama Meclîsa Bajêr a Wanê Semîra Varli ku li ser navê girseyê daxuyanî da, diyar kir ku DTP di hilbijartina 29'ê adarê de li heremê bi ferqeke mezin wekî partiya yekem derketiye û anî ziman ku li Tirkiyeyê jî bûye partiya 4'emîn. Varli, destnîşan kir ku ji ber vê yekê bi pêkutiyên li dijî partiya wan bi şêwaza darbeyê tê xwestin gelê kurd bê vîn bikin. Varli, anî ziman ku di encama hilbijartinê de riya çareseriya aşityane derketiye holê û derbirî ku li ser vê yekê KCK'ê heta 1'ê hezîranê biryara bêçalakiyê daye. Varli, destnîşan kir ku piştî vê biryarê operasyona li dijî DTP'ê hatiye destpêkirin watedar e û wiha dom kir: "Têkçûna AKP'ê ya li herêmê û gotina cîgirê Serokwezîr Cemîl Çîçek a 'Gihîştin sînorê Ermenîstanê' bingehê vê operasyonê amade kir."




Varli, bal kişand ser polîtîkaya înkar û îmhaya yên dewletê û AKP'ê û wiha pê de çû: "Heke bi polîtîkayên, tunekirin, pêkutî, xwîn, şer û kuştinê çareser bibûya piştî 28 serhildanan kurdan ên bi xwînê hatin pelçiqandin serhildana 29'an dernediket. Ji vê yekê jî tê zanîn ku tenê riyek çareseriya pirsgirêka kurd heye ew jî riya diyolog û çareseriya siyasî ye." Varli, di dawiya axaftina xwe de operasyona li dijî DTP'ê şermezar kir û bang li gelê kurd kir ku li partiya xwe xwedî derkevin.

Piştî daxuyaniyê, girseyê heta 5 deqelan çalakiya rûniştinê pêk anî. Piştî çalakiya rûniştinê girse bi sloganan belav bû. **WAN / DÎHA**

## Li Ceyhanê çalakî pêk anîn

*EDENE* - DTP'a Ceyhana Edeneyê, êrîşên li ser DTP'ê bi çalakiya rûniştinê şermezar kir. DTP'a Ceyhanê bi boneya êrîşên li ser DTP'ê şermezar bike, li kolana Kuçukkirim daxuyanî dan çapemeniyê. Di daxuyaniyê de ligel Endamê Meclîsa DTP'ê Abdullah Aydemîr, Endamê DTP'e yê Şaredariya Ceyhanê Seyfettîn Aydemîr, endam û rêveberên DTP'ê gelek kes amade bûn. Di daxuyaniyê de dowîzên "Operasyon ne hiqûqî ne, siyasî ye", "Destê dirêjî DTP'ê dibin bila bişikên" û "Êdî bes e" hatin bilindkirin û dirûşmên wekî "Bijî biratiya gelan", "Êrîş me têk nabin" û "AKP sebra me nena" berz kirin. Serokê Rêxistina DTP'ê yê Navçeya Ceyhanê Mehmet Salîh Demîr, anî ziman ku operasyonên li ser DTP'ê pêk hatine ne hiqûqî ye û bi talîmata AKP'ê pêk hatine. Demîr wiha got: "AKP'ê serkeftina DTP'ê ya 29'ê Adarê tehamul nekir û piştre êrîşên siyasî dest pê kir. Kesên hurmetê ji vîna gel re negire ji xwîna tê rijandin berpirsiyar e. Li ku, kengî û çawa dibe bila bile em dê tu carî dest ji têkoşîna xwe ya aştî, azadî û demokrasiyê bernedin."

## Li Êlihê dem hate zêdekirin

*ÊLIH* - Ji bo 15 kesên di çarçoveya operasyona li dijî DTP'ê de li Êlihê hatîn binçavkirin, dema zêde ya binçavkirinê hate standin. Midûriyeta Polîsan a Êlihê di 17'yê nîsanê di encama serdagirtinên malan de 15 kes binçavkiribûn. Ji bo pirsiyariya kesên bi navên Dogan Şenses, Baran Boral, Mukaddes Oruç, Zeynep Korkut, Mehmet Alturk, Ulaş Ekîncî, Ahmet Altun, Omer Azîzoglu, Denîz Şahîn, Emîn Etîk, Veysî Baltaş, Yilmaz Ganîs, Mehmet Ergun, Ferhat Işik û Semîh Kamîk ji Dozgeriya Komarê ya Êlihê dema binçavkirinê ya zêde hate standin. Di vê navberê de hate zanîn ku ji kesên hatine binçavkirin Emîn Etîk bi boneya pirsgirêka leşkeriyê birine Fermandariya Leşkeriyê.

## YDG-M'î derxistin dozgeriyê

*ÎZMÎR* - 29 kesên ku di çarçoveya operasyona li dijî DTP'ê de hatîn binçavkirin ku Serokê Şaxa NÇM'ê ya Îzmîrê Veysî Guneş jî di nav de ye, duh derxistin Edliyeya Îzmîrê. Di çarçoveya operasyona li hemberî DTP'ê de li Îzmîrê 29 endamên Meclisa Ciwanên Demokratîk û Welatparêz (YDG-M) a DTP'ê hatibûn binçavkirin. Piştî pirsiyariya li Midûriyeta Polîsan 29 kesên Serokê Şaxa NÇM'ê ya Îzmîrê Veysî Guneş di nav de duh derxistin Edliyeya Îzmîrê. Duh heta rojnameya me çûye ber çapê hê jî îfade dayîna ciwanan dom dikir.

## Gel bi meşaleyan meşiya

*STENBOL* - Operasyona li dijî DTP'ê, binçavkirin û girtin, bi meşa bi meşale ya li Bahçelîevler a Stenbolê hate pêkanîn hate şermezarkirin. Nerazîbûnên li hemberî operasyona li dijî DTP'ê û girtina rêveberên wê didomin. DTP'a Bahçelîevlerê, bi meşa bi meşale ya li taxa Yenîbosna ya Bahçelîevlerê li dar xist, binçavkirin û girtin şermezar kir. Nêzî 200 kesên li Parka Pazar Yunus Çaça ya taxa Yenîbosnayê hatin cem hev, li kolana Pazar bi meşaleyan meşiyan. Di dema çalakiya tedbîrên berfireh hatin girtin de bênavber sloganên "DTP vîn e, dest nede vînê", "Pêkutî nikarin me bêzar bikin" hatin avêtin.

www.arsivakurdi.org

Rupel 5++++++:Layout 1 19.04.2009 17:04 Page 1



# Bi devê Ergenekonê waazî didin

**Çapemeniya Cemaeta Fetullah Gulen bi derew û bêbextiyan hewl dide ku siyaseta kurd reş bike. Derewa dawî ya çapemeniya Gulen ew e ku 'ÇYDD'ê burs daye PKK'iyan'. Lê vê carê derewa wan zêde dom nekir. Rastî yekser derket holê**

Li hemberî operasyon û êrîşên li dijî DTP'ê nerazîbûn her ku diçe zêde dibin. Di vê navberê de pêla derewan û bêbextiyan a li dijî DTP'iyên hatine girtin jî zêde dibin. Saziyên ragihandinê yên bi ser cemaeta Gulen ve pêla derewan derxist asta herî bilind. Derewa dawî ew e ku Komeleya Piştgiriyê ya Jiyana Hemdem (ÇYDD) bursê dide PKK'iyan. Lê zêde dom nekir, derewa wan zû aşkera bû. Ligel aşkerabûna vê derewê xwediyên derewê daketin asta bêbextan. Ango bûn 'mûfterî'.

Rojnameya Zamanê bi sernavê 'Ev e lîsteya xwendekarên PKK'î ku ji ÇYDD'ê bursê digirin' kesên ku bursê ji ÇYDD'ê digirin wekî PKK'î nîşan dan.

**Rayedarên PKK'ê axivîn**

Di nûçeyê de hatibû îdiakirin ku 'Di çarçoveya operasyona li hemberî baskê PKK'ê yê bajar de lîsteya kesên bursê ji ÇYDD'ê digirin derket holê'. Di nûçeyê de xwendekarên ku navên wan heyî li kîjan zanîngehan dixwînin û beşdarî kîjan çalakiyan bûna hatibû dayîn.

Rayedarên PKK'ê ku ji ajansa nûçeyan ANF'ê re axivîn; anî ziman ku cemaeta Gulen bi weşanên nijadperest kurdan wekî hedef nîşan didin. Rayedaran diyar kir ku cemaeta Gulen kirinên JÎTEM'ê yên li hemberî kurdan rewa dike û wiha gotin: "PKK'iyekî ku ÇYDD bursê dide nîn e."

**'Piştgirên Ergenekonê ne'**

Rayedarên PKK'ê diyar kirin ku Komeleya Piştgiriyê ya Jiyana Hemdem ji destpêkê heta niha di çarçoveya polîtîkayên asîmîlasyonê de nêzî kurdan dibe û wiha dirêjî da gotinên xwe: "Tarîkat dixwaze Kurdistanê bi dest bixe. Di hilbijartinên herêmî de Cemaeta Gulen, AKP û Artêşa Tirk li hemberî DTP'ê bûn yek. Civînên wan ên hevpar hene. Piştî di hilbijartinan de têk çûn bi vî şêweyî dixwazin tolê hildin. Rastî ew e ku ev tarîkat demeke dirêj e hewl dide ku qetlîamên Ergenekonê yên li hemberî kurdan rewa bikin. Bi ji bo vê yekê di nava hewldanan de ne. Ev cemaet her wekî li dijî Ergenekonê ne dixuyên û bi devê Ergenekonê waazê didin."

**'ÇYDD kurdan asîmîle dike'**

Rayedarên PKK'ê diyar kir ku nûçeya bi sernavê 'Ev e lîsteya xwendekarên PKK'î ku ji ÇYDD'ê bursê digirin' hatiye weşandin bi temamî derew e û wiha dirêjî da gotinên xwe: "Beriya her tiştî bi vê nûçeyê xwendekarên kurd ên li zanîngehan dixwînin kirine hedef. Em faaliyetên ÇYDD'ê yên li Kurdistanê ji destpêkê heta niha wekî hewldanên asîmîlasyonê dibînin. Ev rêxistineke ku kurdan tune dihesibîne ye. Her wekî ku fetulahî kurdan tune dihesibînin. Yek ji wan senteza tirk-îslam diparêze ya din asîmîlasyona kemalîst."

**'Gulen ji bo Amerîkayê diaxive'**

Rayedarên PKK'î bangî malbatên kurd ên di warê hestên olî de hesas jî kir ku li zarokên xwe xwedî derbikevin û wiha got: "Fetullah Gulen li Amerîkayê dijî. Li gorî daxwaza Amerîkayê waazan dide, olkariyê dike. Misilmantiya wî di xizmeta Amerîkayê de ye. Malbatên kurd ên di warê olî de hesas bila bi van nexapin."

**Ji tarîkatê re hişyarî**

Însiyatîfa Gel a Kurdistanê pêr bi daxuyaniyeke nivîskî Cemaeta Fetullah Gulen hişyar kiribû û anîbû ziman ew ê wan ji bo xwe bikin hedef. Însiyatîfa Gel wiha gotibû: "Li Kurdistan û metropolên Tirkiyeyê saziyên aydê Cemaeta Gulen û rêveberên AKP'ê ji bo me hedef in." **AMED / ANF**

## Li Colemêrgê 5 hezar kes meşiyan

Li Colemêrgê bi armanca şermezarkirina operasyon û girtinên li dijî DTP'ê bi tevlêbûna 5 hezar kesan meş hate lidarxistin û daxuyanî hate dayîn.

Ji bo şermezarkirina operasyona li dijî DTP'ê 5 hezar kesên li ber avahiya DTP'a Colemêrgê hatin cem hev, bi sloganên "Pêkutî nikarin me bêzar bikin", "Bijî Serok" heta ber avahiya şaredariyê meşiyan. Şaredarê Colemêrgê Fadil Bedîrhanoglu, rêveberên DTP'ê û nûnerên rêxistinên civakî yên sivîl jî tevli meşê bûn. Bi sedema daxuyaniyê polîsan tedbîrên berfireh girtin. Rêveberê DTP'a Bajêr Şukru Karaduman, li ser navê girseyê daxuyanî da. Karaduman diyar kir ku AKP'ê ji hilbijartina 29'ê adarê encama pêwîst negirtiye. Karaduman, destnîşan kir ku gelê kurd di hilbijartina 29'ê adarê de ji bo çareseriyê rê nîşanî dewletê daye û anî ziman ku kurd ji her demê zêdetir ji bo çareseriyê amade ne. Karaduman, destnîşan kir ku di demek çareseriya siyasî tê nîqaşkirin de destpêkirina operasyonek wiha manîdar e û wiha got: "Mifteya çareseriya pirsgirêka kurd dîlok e. Biryara PKK'ê ya bêpevçûniyê ji bo pêvajoya çareseriya demokratîk girînge. Lazim e ev yek li ber çavan bê girtin. Ev firsatek mezin e. Em bang li dewlet û hikûmetê dikin ku di vê mijarê de bihîstiyar nêzîk bibin. Peywirak mezin dikeve ser milê siyasetmendaran, çapemeniyê û rêxistinên sivîl ên civakî jî. Wekî DTP'ê em pêkanînên antî-demokratîk şermezar dikin. Em bang li gelê xwe dikin ku nerazîbûna xwe ya demokratîk nîşan bidin."

Piştî daxuyaniyê heta 5 deqeyan çalakiya rûniştinê hate lidarxistin. Piştî daxuyaniyê girse dîsa heta ber avahiya DTP'ê meşiya. **COLEMÊRG**

## Lêxwedîderketina ji bo DTP'ê gur bû

Operasyona li dijî DTP'ê li navçeyên Sancaktepe, Bagcilar, Uskudar, Kartal, Sultangazî, Esenyurt û Başakşehîrê yên Stenbolê hate şermezarkirin. Li Kocaeliyê jî operasyona li dijî DTP'ê bi çalakiya rûniştinê hate şermezarkirin.

Koma li Kolana Demokrasiyê ya Sancaktepeyê gihişte hev, dowîzên, "Dest nede îradeya min", "Ev agir dê we jî bişewitîne", "DTP gel e gel li vir e" hildan û sloganên, "AKP xwe şaş neke sebra me xilas neke", "DTP îrade ye hûn nikarin dest bidinê" û "Zordarî me bêzar nakin" avêtin. Sazî û partiyên wekî ESP û SDP'ê jî piştgirî dan daxuyaniyê.

Bi hezaran kesên li ber avahiya DTP'ê gihiştin hev bi sloganan heta Meydana Koyîçiyê meşiyan. Girseya sloganên, "AKP xwe şaş neke sebra me xilas neke" û "DTP gel e gel li vir e" avêtin, zordarî şermezar kirin. Koma qelebalix a li ber DTP'ê ya Sultangaziyê hate cem hev, bi çepik û sloganan operasyon û binçavkirin bi tundî şermezar kirin. Komê demeke dirêj tenê bi çepikan zordariyên li ser DTP'ê protesto kirin


Li Uskudarê jî, komek qelebalix a li ber avahiya DTP'a Navçeyê hate cem hev, dovîzên "Em hemû DTP'yî ne", "Êdî Bes e" rakirin û bi sloganên, "Pêkutî nikarin me bêzar bikin" û "Bijî biratiya gelan" operasyona li dijî DTP'ê şermezar kir. Serokê DTP'a Uskudarê Salîh Seleplî ku li vir daxuyanî da, diyar kir ku di dema operasyonê de avahiya wan a navçeyê jî rastî êrîşa bi keviran hatiye. Komek qelebalix a li ber avahiya DTP'a Başakşehîrê hate cem hev, li hemberî operasyonê nerazîbûn nîşan da. Berdevka Meclîsa Jinan a DTP'ê ya Navçeya Başakşehîrê Semra Ecer ku li ser navê komê daxuyanî da, diyar kir ku bi operasyonan dê têkoşîna azadiya kurdan neyê şikandin.

Li Bagcilarê jî, komek qelebalix ku li ber avahiya DTP'a Navçeyê hatin cem hev, bi çepik û sloganan operasyon şermezar kirin. Di çalakiya ku Platforma Piştgiriya Sosyalîst (SODAP) û ESP'iyan jî piştgirî da de, bênavber sloganên, "Pêkutî nikarin me bêzar bikin", "Destên dirêjî vînê bibin bila bişkên" û "AKP şaş nebe me dernexe çiyan" avêtin. Seroka DTP'a Bagcilarê Hafize Aymelek ku li ser navê komê daxuyanî da, diyar kir ku pêkutî û girtin nêzîkatiya AKP'ê ya ji bo çareseriya pirsgirêka kurd dîşan dide. DTP'a Kartalê jî, li Qada Kartalê daxuyanî da çapemeniyê. Di daxuyaniyê de operasyon û girtin hatin şermezarkirin. Di daxuyaniyê de hate xwestin ku DTP'iyên girtî bên berdan.

**Li Kocaeliyê jî çalakî**

DTP'a Navçeya Daricayê bi piştgiriya EMEP'a Navçeyê êrîşên li ser DTP'ê şermezar kirin.

Di daxuyaniya li ber avahiya DTP'ê hate dayîn de sloganên, "Zordarî me bêzar nakin", "Îmha û înkar me bêzar nake" û "Bijî biratiya gelan" hatin avêtin. Serokê Rêxistina DTP'ê Hasan Afşîn daxuyanî xwend û zordariyên li ser partiya xwe şermezar kirin. Afşîn diyar kir ku AKP'ê têkçûna xwe ya piştî hilbijartinan hezm nekiriye û êrîşê DTP'ê dike. Afşîn biryara bêçalaktiyê ya PKK'ê bi bîr xist û diyar kir ku şerxwaz naxwazin aştî pêk bê. Afşîn xwest ku hemû derdorên demokratîk li cem DTP'ê cihê xwe bigirin. Piştî daxuyaniyê 5 deqeyan çalakiya rûniştinê pêk hat. **STENBOL / KOCALELÎ / DÎHA**




*Bi taybetî di çalakiyên li metropolên Tirkiyeyê pêk tên de heman hêma derdikeve pêş: Em hemû DTP'î ne.*




## 'Êrîş dê bê bersiv nemînin'

Hate hînbûn ku Însiyatîfa Gel a Demokratîk a Edeneyê li Edeneyê li taxên ku kurd zêde lê dijîn belavok belav kirine. Însiyatîfa Gel a Demokratîk di belevokan de balê dikişîne ser girtinên nûner û endamên DTP'ê. Her wiha di belavokan de tê destnîşankirin ku ev êrîşên ku li ser îradeya kurdan pêk tên dê bê bersiv nemînin.

Di belavokê de hate diyarkirin ku operasyona li ser DTP'ê, piştî ku KCK'ê biryara bêpevçûnê daye pêk hatiye. Di berdewamiya belavokê de wiha tê gotin: "Hikûmeta AKP'ê û Artêşa Tirk li Kurdistan û Tirkiyeyê operasyon dane destpêkirin û piştî encama hilbijartinan dixwazin îrade û azadiya gelê kurd tasfiye bikin." **EDENE / ANF**

## Di çalakiyan de hat gotin ku kurd nabin qurban

Partiyên siyasî û rêxistinên civakî yên li Edene û Îdirê operasyonên li ser rêveberên DTP'ê bi daxuyanî û meşan şermezar kirin.

Li Îdirê rêveberên DTP'a Bajêr, nûnerên saziyên sivîl û endamên meclîsa bajêr û şaredariyê jî di nav de bi sedan kes li ber avahiya DTP'ê hatin cem hev û daxuyanî da çapemeniyê. Serokê Rêxistina Bajêr Ahmet Barbaros, anî ziman operasyona piştî hilbijartinê li ser DTP'ê dest pê kiriye encama netehamulkirinê ye.

**Li Edeneyê meş hate pêkanîn**

Endam û rêveberên DTP'ê yên navçe û bajêr, rêveberên EMEP, ESP, DÎP, ÎHD, TUHAYD-DER û MKM'ê jî di nav de nêzî hezar kesî li Qada 5 Ocakê li hev kom bûn û xwestin bimeşin. Midûriyeta Polîsan ku tedbîrên fireh girtin, diyar kir ku ew destûr nadin ku girse bi awayekî girseyî heta ber avahiya adliyê bimeşin. Lê belê girseyê ligel hişyariya polîsan jî pankart, "Êdî bes e, em kurd in ne qurban in" vekir û meşiyan. Çalakî piştî rûniştina 5 deqeyan bi dawî bû. **EDENE/ÎDIR**

# NATO Rûsyayê dizêrîne

## Piştî şerê Rûsya û Gurcistanê atmosfera di navbera Rûsya û NATO'yê de germ bû lê bi girtina biryara tatbîkata NATO'yê ya li Deryaya Reş wisa dixuye ku dê atmosfer hêj germtir bibe



Roja 6 û 1'ê hezîranê li Deryaya Reş NATO û Gurcistan dê dest bi operasyonê bikin. Lê Rûsyayê bertekeke tûnd nîşan da û ev hewldan wek hewldaneke gêjîtî bi nav kir. Ji ber pozîsyona tatbîkatê wisa dixuye ku dê NATO û Rûsya dê hê pirtir li hemberî hev daxuyaniyan bidin û hev rexne bikin.

Li ser mijarê Sefîrê Rûsyayê yê NATO'yê Dmîtrî Rogozîn tatbîkat wek gêjîtî û provakason bi nav kir. Sefîr Rogozîn xwest ku NATO tatbîkatê betal bike.

Rogozîn li bajarê Voroneja Rûsyayê daxuyanî da çapameniyê û pirsên rojnamegeran bersivandin û wiha got: "Roja duşemê Anders Fogh Rasmussen dibe Sekreterê Giştî yê NATO'yê. Min ji wî re nameyek şand û jê xwest tatbîkat bê betalkirin." Rogozîn tatbîkat wek hewdana zirdînekî destnîşan kir.

Rogozîn hincetên betalkirina tatbîkatê vegot û wiha pê de çû: "Di destpêkê de ez dixwazim bêjim ku li vir ewlehî û baweriya bi tatbîkatê nîn e. Di bin pozê me de li hemberî me qebê dixwazin. Heta xetereya leşkerîya di navbera Rûsya û NATO'yê de ji holê neyê rakirin ev tatbîkat ji bilî provakasyonê nabe tu tiştekî din."

Lê Sekreterê Konseya Wezîrên Parastina Welatên Serbixwe Aleksander Sînaîskî diyar kir ku di tatbîkatê de tu problem nîn e. Sînaîskî daxuyanî da Ekho Moskwê. Di daxuyaniyê de got ku ev ne manevrayek e; divê de tiştekî ku jê bê tirsîn nîn e; her tişt di nav prosedurê de pêk tê. Fermandarê Rûs diyar kir ku biryara tatbîkatê beriya şerê tebaxa sala 2008'an ya di navbera Rûsya û Gurcistanê de hatiye girtin.

Serokdewletê Rûsyayê Dmîtrî Medvedev jî biryara tatbîkatê bi zimanekî tund rexne kir û NATO hişyar kir. Di hişyariyê de destnîşan kir ku pêwîstî pê hebe dê derbarê tatbîkatê de hin biryaran bigirin.

Serokomarê Abhazyayê Sergey Bagapş jî diyar kir ku tatbîkata NATO'yê ya Deryaya Reş xizmetî îstîkrara herêmê nake û ew ê jî li dijî tatbîkata NATO'yê tatbîkata xwe pêk bînin. **MOSKOW**

# Barzanî bi generalê amerîkî re rûnişt

Serokê Herêma Federal a Kurdistanê Mesut Barzanî bi fermandarê hêzên biyanî yên li Iraqê General Ray Odierno re rûnişt. Hat gotin ku pirsgirêka Kerkûkê, PKK û têkiliyên Herêma Federal a Kurdistanê û Iraqê şîrove kirine.

Hat gotin ku Barzanî di hevdîtinê de gotiye ku li herêmê pirsgirêka sereke ya Kerkûkê ye. Odierno jî diyar kir di çareserkirina pirsgirêkên Iraqê de cihê NY'ê girîng e û pirsgirêk dê kontrola wê de bên çareserkirin.

Odîerno destnîşan dike ku li Iraqê rewş niha baştir e û wiha didomîne: "Pêwîstî bi pêşxistinên siyasî heye." Li gorî Odierno ewlehiya Iraqê jî bi pêşxistinên siyasî ve girêdayî ye.

Hat diyarkirin ku di têkiliyên bi Tirkiyeyê re neyartiya li hemberî PKK'ê jî di navbera xwe de axivîne û li ser xurtkirina ewlehiya sînor rawestiyane. Beriya vê jî di civîna sêalî ya di navbera Amerîka, Tirkiye û Iraqê de biryar hatibû girtin ku li dijî PKK'ê û kurdan tifaqa neyartiyê xurt bikin.

Barzanî xwest ku ji bo pirsgirêkên di navbera Hikûmeta Herêma Federal a Kurdistanê û Iraqê de bên çareserkirin, Makeqanûna Iraqê esas bê girtin. **HEWLÊR**

## Li Somaliyê rejîma şerîetê hat îlankirin

***MOGADÎŞU*** - Parlamentoya Somaliyê biryara îlankirina pergala şerîetê da. Ji bo girtina biryara îlankirina şerîetê Desteya Wezîran pêşengiyê kir. Armanca biryarê ev e ku dilê mîlîtanên îslamperest xweş bikin û ew bigirin nav xwe. Komên îslamperest biryar bi bextewarî pêşwazî kirin. Lê dixuye ku rêxistina El Şabab dê vê biryarê bes nebîne. Başûr û navenda Somaliyê di bin konrola rêxistina El Şabab de ye. Li gorî agahiyên hatin bidestxistin ligel vê biryarê jî wisa dixuye ku dê rêxistina El Şabab şerê li dijî hikûmetê ranewestîne. Hikûmeta Navendî ya Somaliyê tenê beşeke paytext Mogadîşuyê di bin kotrola xwe de digire.

## Amerîka beşdarî civîna NY'ê nabe

***WASHINGTON*** – Neteweyên Yekbûyî di nav vê hefteyê de li paytexta Swîsre Cenevreyê civîna salane ya Konferansa Nijadperestiyê li dar dixe. Civîna yekemîn li Afrîkaya Başûr di sala 2002'an de hatibû lidarxistin. Di wê civînê de Isarîl û Siyonîzm hatibû şermezarkirin. Israîl û DYA'yê ji ber vê, konferans terikandibû. Civîna îsal jî Israîl, Awisturalya û Kanada ji ber ku Serokomarê Îranê dê beşdar bibe protesto kirin û beşdar nabin. Piştî van welatan DYA'yê jî biryara xwe diyar kir û got: "Ez jî beşdar nabim". Tirsa wan ev e ku dê careke din Israîl ji ber nijadperestiyê di konferansê de bê mehkûmkirin.

# Li Pakistanê teqîn, 20 kes mirin

Li Pakistanê mîlîtanek wesayîta xwe ya ku madeyên teqemeniyê lê barkirî bû li noqteya kontrola polîsan xist û wesayîta xwe teqand. Ji ber vê teqînê 20 kes mirin. Teqîn li navçeya Hanguyê pêk hat û bi polîsan re 2 kesên sivîl jî hatin kuştin û bi kêmanî 12 kes jî birîndar bûn.

Serokdewletê Pakistanê Asif Elî Zerdarî û Cîgirê Serokwezîr Yusuf Gîlanî bûyer şermezar kirin. Zerdarî diyar kir ku ew ê êrîşkarên bûyerên bi vî rengî tune bikin.

Ev demek e li bakûrojavayê Pakistanê rêjeya bûyerên ku mîlîtanên Talîban û komên îslamperest yên din zêde bûne û her diçe rêjeya teqîn, serdagirtin, zêdekirina kontrola herêman berfiretir dibe. Ji ber vê jî ji hikûmeta Pakistanê pirtir Amerîka ketiye nav panîkê.

**Holbrooke got alîkarî!**

Nûnerê taybet ê Amerikayê yê Afganistan – Pakistanê Richard Holbrooke diyar kir ku ji ber van bûyeran ji hêzên navneteweyî xwest ku hê pirtir alîkariyê bidin Pakistanê û li dijî 'terorê' têbikoşin. Holbrooke diyar kir ku 5 milyar dolar alîkariya ku ji bo Pakistanê hatiye berhevkirin têr nake. Ji bo ku Pakistan karibe li hemberî Talîban û tifaqên wê şer bike Amerîka milyarek dolar dide.

Ji bilî vê Îran, Erebistana Siûdî û Mîrîtiyên Hevgirtî yên Ereb soz dane ku alîkariyeke xurt bidin hikûmeta Pakistanê.

Nûnerê Taybet ê Amerîkayê Holbrooke diyar dike ku El Qaîde û Talîban talokeyên cidî ne û ne tenê ji bo wan, ji bo civaka navneteweyî jî tehdîdeke cidî ne. Holbrooke got ku zêdebûna bûyerên Pakistanê dê bandorê li Afganistanê jî bike.

**5 milyar dolar dide Pakistanê**

Japonya û Bankaya Cîhane ji bo alîkariya Pakistanê li Tokyoyê konferans li dar xist. Di konferansê de 40 welatan cih girt û biryar hat girtin ku 5 milyar dolar alîkariya Pakistanê bê kirin.

Amerîka û Japonya her yek milyarek dolar; YE, Siûdî û Îran jî her yek bi sedan milyon dolar sozê alîkariyê dabûn Pakistanê. Balkêş e ku Amerîka û Îran dema mijar şerê li dijî Talîban be mil didin hev û alîkariyê didin Pakistanê.

Zerdarî di konferansê de diyar kir ku ew ê li hemberî Talîban û rêxistinên din yên şerîetparêz şer gur bikin û wan ji binî ve biqedînin. **ÎSLAMABAD**

FerAşîn
Ahmet Dere
farasin@hotmail.com



# Dema ku dewlet şaş bibe

Encamên hilbijartinên 29'ê fdarê hejmara pir derdoran tevlihev kir. Çi AKP, CHP. MHP û çi jî saziyên dewletê ên din, ji heman demê vir ve ketin nava rewşeke şaşbûyî û nizanin çi bikin. Ji ber heman rastiyê rewşa wan a psîkolojîk jî xerab bûye. Bi awayeke din mirov dikare bêje Tirkiye bûye ware dînan.

Belê, operasyona lidijî DTP'ê tê meşandin bi destê rayedarên şaşbûyî û di nava atmosfereke tevlihev de pêk tê. Her kesê ku di serê wî de hineke mêjî hebe wê bizanibe ev operasyon ji destpêkê ve pûç e, wê nikaribe bigehêje tu encamekê jî. Dibe ku rayedarên CHP'ê û yên MHP'ê ji vê operasyonê kêfxweş bin, lê belê ne AKP û ne jî tu saziyeke din a dewletê nikarin ji vê bûyerê sûd werbigirin. Di rojên pêş de wê ev rastî baştir derbikeve pêşberî me.

Hin derdor vê operasyonê tenê weke bûyereke hikûmetê dinirxînin. Ne wisa ye, ev kar bitevahî yê dewletê ye. Rewşa şaşbûyî di nava hemû qadên dewletê de bibandor e.

Piştî roja 29'ê adarê min texmîn dikir ku lidijî rayedarên DTP, an jî lidijî gelê kurd, wê êrişekê çêbibe. Koalîsyona ku di navbera partiyên sîstemê de çêbibû bingehê ji van bûyeran re amade kiribû. Li gorî wêneyê Tirkiyeyê ne mimkûn bû ku ev operasyon çênebûbûya. Lewre ez dibêmê qet pêwîst nîn e kes moralê xwe xerab bike, ji destpêka salên 1970 vir ve em kurd lidijî vê zihniyetê têdikoşin, heya niha me pir şehîd dan û bi dehan hezaran girtiyê me çêbûn. Ev bûyer jî pêleke ji wan zextan e.

Gelê kurd li dijî zordariyê serî rakir û tevgera xwe ya azadiyê bi rêk û pêk kir. Di vê riyê de me pir operasyon dît, şerê qirêj hat jiyîn. Digel hemû zexta dewleta hov gelê kurd zêdetir bi tevger bû, têkoşîna xwe li pêş xist. Her ku dewleta tirk li ser gelê kurd de çû wiqas hêzbûyîn û rihê xwe rêxistinbûyînê jî di nava gel de li pêş ket. Îro jî em di nava rewşeke heman de ne.

Roja ku operasyon li dijî DTP'ê pêk dihat Îlker Başbûg derketibû pêşperî raya giştî a tirk û dersa perwerda îdeolojîk dida. Di welateke medenî de serleşker bi vî awayî dernakevin pêşberî raya giştî. Lêbelê li Tirkiyeyê ev weke nimeteke xwedê tê dîtin û bi rojan liser niqaş têne kirin. Min bixwe di axiftina Başbûg de tişteke nû nedît, zihniyeta kevnar dîsa xwe dubare dike.

Di qada navneteweyî de hin helwest li dijî vê operasyonê çêdibin. Lêbelê hê bi awayeke fermî ne Amerîka û ne jî YE'yê daxûyaniyekê nedane. Dibe ku di rojên pêş de ji van derdoran hin dengên nerazîbûyînê derkevin, lê belê dîsa jî ev nayê wateya ku ew alîkarê zihniyeta kevnar a dewleta tirk nîn in. Kavnariya zihniyeta dewleta tirk ji wan re zêdetir bifeyde ye.

***

Ji destpêka îsal vir ve niqaşên derbarê çêkirina Konferanseke Kurd de hatin pêşxistin. Bi taybetî dewleta tirk ji van niqaşan re bingeh amade kir û kete nava hewldanên tenzîmkirina konferansê. Lê belê encamên hilbijartinên 29'ê adarê wan hejmaran jî xerab kir.

Wisa diyar e ku wê hawldanên ji bo vê konferansê vala derkevin. Piştî vê operasyona li dijî DTP'ê, ez hêvîdarim rayedarên hêzên başûrê Kurdistanê jî rastiya dewleta tirk baştir bibînin. Tenê dîtin na, divê ew li dijî vê helwesta dewleta tirk bibin xwediyê helwestekê birûmet jî.

# Obama: Em ê guh bidin cîranên xwe

Li Trînîdad û Tobagoyê civîna Perzemîna Amerîkayê hat lidarxistin. Serokdewletê Amerîkayê Barack Obama jî beşdarî civînê bû. Obama di civînê de got ku ew ê hewl bidin ku rê û rêbazên hevkariyê zêdetir bikin.

**Chavez pirtûk da Obama**

Beriya ku civîna welatên Amerîkaya Latîn dest pê bike Serokdewletê Venezuellayê Hugo Chavez destê Obama girt û pirtûka Eduardo Galeano ya 'Damarên vekirî yên Amerîkaya Latîn' (The Open Veins of Latin America) dayê. Pirtûk dîroka Amerîkaya Latîn vedibêje. Di dema desthilatiya George Bush de Chavez û Bush pir zimançeleqiyê dikir. Lê Chavez pêr destê Obama girt û xwest di nav wan de dostanî bi pêş bikeve.

**Têkiliyên bi Kubayê re**

Obama di axaftina xwe de xwest ku têkiliyên di navbera Amerîka û Kubayê de bên nûkirin. Rêvebiriya Obama der barê seyran û guhestina peran ya Kubayê de hin astengiyan ji holê rakir. Lê ji ber zextên kesên bi eslê xwe ji Kubayê ne lê li Amerîkayê dijîn, li ser Kubayê ambargo didome.

Wezîra Karên Derve ya Amerîkayê Hillary Clîntonê destnîşan kiribû ku polîtîkaya Amerikayê ya li ser Kubayê têk çûye. Xwest ku polîtîka di ber çavan re bê derbaskirin.

Clîntonê li Komara Domînîk bextewariya xwe ya ji bo daxwaza Serokdewletê Kubayê Raul Castro diyar kir. Castro xwest ku ligel Washingtonî ew diwazin mijarên mafên mirovan, azadiya çapameniyê û girtiyên siyasî jî di nav de hemû mijaran nîqaş bikin. Lê Castro xwest ku ew jî wekî dewleteke di heman statuyê de bên qebûlkirin.

**Kuba ji nû ve dê bibe endam**

Kuba di civîna bilind ya Perzemîna Amerîkayê de ne xwedî temsîliyetê ye. Sekreterê Giştî yê Rêxistina Dewletên Amerîkayê Jose Miguel Insulza diyar kir ku dê ew ji bo Kuba ji nû ve bibe endam dest bi hewldanan bikin.

Nûnertiya Kubayê ya Rêxistina Dewletên Amerîkayê di sala 1962'an de hatibû rawestandin. Rêxistinê diyar dikir ku Komunîzm ne li gorî avabûna rêxistinê ye. **TOBAGOY**

www.arsivakurdi.org

# 'Bila DTP'î bêne berdan'

## Dayikên Aştiyê li hemberî nûçeyên têkildarî DTP'iyan di çapemeniyê de bi awayekî berovajî tên dayîn nerazîbûn nîşan da. Dayikan got ku operasyon li hemberî serkeftina DTP'ê pêk hatiye



Nerazîbûnên li hemberî operasyona li dijî DTP'ê hate destpêkirin didomin. Însiyatîfa Dayikên Aştiyê, xwest DTP'iyên hatine binçavkirin û girtin bi lez bên berdan.

Nerazîbûnên li hemberî operasyona ku li tevahiya Tirkiyeyê di heman demê de li dijî DTP'ê hate destpêkirin didomin. Însiyatîfa Dayikên Aştiyê, di civîna li avahiya însiyatîfê li dar xist de, pêkutiyên li hemberî DTP'ê şermezar kir û xwest DTP'iyên girtî zûtirîn demê bên berdan. Endama Însiyatîfa Dayikên Aştiyê Nezahat Teke ku di civînê de axivî, li hemberî nûçeyên têkildarî DTP'iyan di çapemeniyê de bi awayekî berovajî tên dayîn nerazîbûn nîşan da. Teke, bal kişand ku piştî serkeftina DTP'ê ya di hilbijartinên herêmî de destpêkirina operasyonek wiha manîdar e. Teke, bi bîr xist ku KCK'ê heta 1'ê hezîranê biryara bêçalakiyê dirêj kiriye û wiha dom kir: "Biryara KCK'ê ya bêçalakiyê, bi hêviya 'Dibe ku ev xwîn raweste, pirsgirêka kurd bi riyên demokratîk çareser bibe' av li dilê me yê dişewite kir. Lê ev operasyona li hemberî DTP'ê hate destpêkirin, careke din di dilê me de hêviya aştiyê şikand."

Teke, daxuyand ku operasyon ne tenê li dijî DTP'ê hatiye destpêkirin û wiha pê de çû: "Avahiya Însiyatîfa Dayikên Aştiyê ya Stenbolê rastî serdagirtinê hat û rojnameya Azadiya Welat hate girtin. Ev pêşketin me dixe nava fikaran. Di nava navê AKP'ê de peyva 'Edaletê' heye, lê ev peyv bi tiştên pêk tîne re nakok e. Edalet bi binçavkirinan pêk nayê. Ancax bi naskirina nasnameya kurdan, rawestandina şer, bilindkirina asta aborî û pêşxistina demokrasiyê edalet dikare pêk bê." Teke, operasyona li hemberî DTP'ê şermezar kir û xwest kesên hatine girtin zûtirî demê bên berdan. **AMED**

# Gundê dayikên biçûk

Li gundê Damlacika Îzmîrê zarokên keç hêj di 13 û 15 saliya xwe de tên zewicandin. Li gorî kevneşopiyê malbat hêj zarokên wan di dibistana seretayî de ne soz didin hev du. Dema zarok dibistanê diqedîne têne zewicandin. Li gund 20 zarok niha li benda roja dawetê ne.

Gundê Kemalpaşa a navçeya Damlacika Îzmîrê sed sal e ev kevneşopî pêk tê. Li gorî kevneşopiyê zarokên kur û keç hêj di biçûkatiyê de tên zewicandin. Heta niha li gund tenê keçikek zanîngeh qedandiye. Zarokên kur piştî zewacê dîsa xwendina xwe didomînin, lê keçik piştî ku zewicî divê dest ji dibistanê berdin. Hate diyarkirin ku ji bo ku mîras neyê parçekirin ev rêbaz tê bikaranîn û zarok dibin qurbana wê kevneşopiyê. Her wiha qeymeqam û Midûriyeta Perwerdehiyê ya Navçeyê jî li hemberî wê kevneşopiyê bêdeng dimînin. Her wiha ji ber zewaca zû gelek doz hatin vekirin, lê ev doz bêencam dimînin. Ji ber ku heta ku doz bi encam dibe zarok dibin 18 salî û tu wateya wan dozan namîne.

Gelek zarokên keç vî tiştî wekî lîstik dizanin. Ligel helwesta rayedaran dîsa gund dest ji kevneşopiya xwe bernadin. Li gorî muxtar kesek bi zorê nazewicînin li gorî daxwaza zarokan daweta wan tê kirin. **ÎZMÎR**


# Ji bo derdorê baldar in

Li gorî lêkolîna derdorê mêr ji bo pêşerojê tiştekî nafikire lê jin ji bo pêşeroja xwe û zarokên xwe xwedî li derdorê derdikevin.

Di lêkolînê de hate destnîşankirin ku jin ji bo derdorê bêtir baldar in. Lêkolîn ji hêla komeleyên xwaze û fîrmayên ku amûrên bûroyan çêdikin hate çêkirin. Li gorî lêkolînê mêr ji bo pêşeroja derdorê xwedî fikrek nîn e û fikara wan jî nîn e.

Li gorî Peymana Çarçoveya Guhertina Avhewayê ya Neteweyên Yekbûyî ya Protokola Kyotoyê welatên pêşketî û saneyiya pêşketî de divê asta gaza serayê kêm bibe. Di vê helê de berpirsiyariya hikûmetê gelek e. Divê rêxistinên sivîl ji bo parastina derdorê bêne hişyarkirin û bên perwerdekirin. Di mijara parastina derdorê de jin li gorî mêran baldartir tevdigerin. **ENQERE**


# Bîranîn



Mahmut CEYLAN
1943 Bismil -2009
Mexmûr

*Agirê serê çiyan*
*Birîna sehîdan*
*Dildariya salan*
*Û ronahiya çavan*
*Li tirsa ser dijminan*
*Loriya dayikan*
*Armanca hevalan*
*Hêlîna hêviyan*

Li ser navê neviyên wî
Tirêj, Çeko û Bermal


# Krîza aborî şîdeta li ser jinê zêde dike

Beşa Zanyarî ya Psîkiyatrî ya Fakulteya Tib a Zanîngeha Stenbolê Prof. Dr. Şahîka Yuksel, diyar kir ku di nav civakê de jin her tim di rêza duyem de cih digire û her tim keda wê kêm tê dîtin. Yuksel, destnîşan kir ku di demên krîzan de jî jin dibin mexdûr, rastî şîdetê tên û neçarin bêewlehî di şertên nebaş de kar bikin.

Prof. Dr. Şahîka Yuksel, di civîna ku li Antalyayê pêk hatî de axivî û destnîşan kir ku krîza aborî, şer û afetên xwezayî li welatan dibe sedema krîzan. Yuksel di axaftina xwe de bal kişand ser bandora krîzê ya li ser jinê û wiha got: " Hem di krîzên aborî û şer û afetên xwezayî de herî zêde jin dibin mexdûr. Di nav civakê de jin her tim di rêza duyem de cih digere. Ji ber vê jî tu caran mexdûriyeta wan nayê ber çavan. Dema mirov tabloya Tirkiyeyê derdixe holê rewşa jinê xuya dike. Li Tirkiyeyê xwendin û nivîsandina jinê li gorî mêr gelekî kêm e, hejmara betaliya jinê du qet zêdeye, jin bê qeyd û di nav şert û mercên xirab de dixebitin û qedrê keda jinê nîn e."

Yuksel, got ku di dewrên krîzan de rewşa aborî her diçe xirab dibe û gelek mêr ji kar tên derxistin. Yuksel, destnîşan kir ku jin jî neçar dimînin ku alîkarî bidin aboriya malbatê û di nav şert û mercên nebaş de dixebitin û pereyekî kêm distinin. Yuksel, daxuyand ku xizanî dibe sedema jidûrketina nav civakê û bi taybetî jî jin. Yuksel wiha dirêjî da axaftina xwe: "Heke di malbatekê de kesek nexebite û nikaribe ji xwe re kar bibîne rewşa aboriya wê malbatê nebaş e. Jin jî neçar dimîne ku malê bi rê ve bibe. Jin li bazarê sebze û fêkiyên xirabûyî berhev dike û di karên neewle de dixebite."

**Şîdet zêde dibe**

Şahîka Yuksel diyar kir ku li gorî lêkolînekê heke li welatekî krîz hebe şîdeta li hemberî jinê jî zêde dibe. Yuksel mînaka tûfana Katerînayê ya rojhilata başûrê Asyayê da û got ku piştî tûfanê şîdet, taciz û tecawiza li hemberî jinê zêde bû. Yuksel, destnîşan kir ku ligel van tiştan jin li hemberî wan pêkanînan dîsa refleksên xwe nîşan dide. Yuksel daxuyand ku penaberên jin, jinên ku di wargehên penaberan de dimînin, jinên ku piştî erdehejê li konan dijîn, jinên ku mal paqij dikin, xwarinê amade dikin û jinên ku ji bo xwarinê dikevin rêzê û hwd. hemû jin in û du qet zehmetî dikêşin. Yuksel da zanîn ku ligel vê rewşê mêr jî li quncikekî rûdine û li jinan temaşe dike. **ANTALYA**



# Hezar wênekêş tevli pêşbirkê bûn

3'yemîn pêşbirka wêneyan a Anadolu Hayat Emeklîlîkê qediya. Kesên ku xelat wergirtin diyar bûn. Serlêdana pêşbirkê îsal gelek bû. Pêşbirk bi navê 'Di jiyanê de çend wêne nêrîna jinê vedibêjin' hate lidarxistin. Bi tevahî hezar û 5 wênekêş bi 4 hezar 552 wêneyên xwe tevli pêşbirkê bûn. Ji bo pêşangehê jî 42 berhem hatin bijartin. Di pêşbirkê de wêneyên bi navê 'Serê min ê bi dû' bû yekem. Pêşbirk her sal wekî kevneşopiyekê didome. Ji her çar aliyê Tirkiyeyê bi hezaran wêne têne hinartin bo pêşbirkê. **STENBOL**

GULAN BOTAN

# Bazinên giran -1-

Di şeveke tarî de, bi dengê hilhila dilê dayika xwe rabû. Dayika wê di nava çeltikê de xwarin amade dikir. Te digot qey ji şevê wext didizî. Biriqandina çavên wê, tarîtiya şevê diqetand. Hilhila dilê wê, çeltik tijî xwarin kir û bir. Di nîvê şevê de dayika wê winda bû...

Dema hat, te digot qey çûye cinetê û hatiye. Coşa wê, wekî coşa ava biharê bû. Çavên wê û her dera bedena wê ketibû wê coşê û wekî rûbarên biharê diherikî nîvê şevê. Te digot qey diya wê ji nû ve hatiye dinê. Li her tiştî cuda dinêrî. Şewqa dilê wê dida çavên wê yên wekî nîvê havînê bayeke hênik bû. Ew baya ku li wan jî dida.

Gelek gotin, nedihatin gotin, lê gelek wate ji nêrînên dayika wê diherikîn. Wext hespê rewan bû, kes nedigihîştê. Di bin bêhna bilbizêk (meşe) û gangilokan de etar dihatin gundê wan. Wan ji etara dikirîn kilê kildankî û bazinên şîn. Bazinên wan ên reng û reng di bin tîrêjên tavê de çavên wan diteyisandin. Bazinên wan sivik bûn wekî taca bilbizêk û dinane kirê bû. Gelek caran ew diçûn hêlekanê, heta ku êvar dihat ber deriyê rûyê dinê, ew jî diçûn ber deriyê mala xwe. Gelek şev û roj her wekî vê şevê û rojê derbas bûn...

Carekê ew mirovê ku di şevê de ji wan re roj dianîn, wan jî dîtin. Bi wan re zarok, dayika wan re dayik, mezinan re mezin bûn. Demek derbas bû ku êdî wê fam kir ku biriqandina wan, ji dilê wan dihat. Ji ber ku carina cilên wan lewitî jî bûn, lê dîsa jî ev mirov spehî bûn. Qirêjê ew nedilewitandin. Menîfa, di navbera leyîstok û van mirovan de diçû dihat. Di nîvê şevê de roj dida mala wan û Menîfa ji nû ve radibû ser xwe û pirsên xwe didomandin. Carina wê digot qey şev stêrkên xwe li çavên wan mirovan direşîne. Lê dema wê li ezmanan dinêrî, şevê di ezmanan de xwe dîsa xemilandibû. Dîsa wê dipirsî ji dayika xwe ma vana ji şevê stêrk dizîne?

Dayika wê dikeniya û digot, ew bi xwe stêrk in, ne hewce ye ku stêrkên asîmanan bidizin. Gelek caran Menîfayê li milê wan raket û ket xewn û xeyalan. Di xewnên xwe de carina bazinê xwe dida wan, lê wan bazinên we nedibirin. Her ji Menîfayê û gelek zarokên din re gangilok û bilbizêk dianîn, bi hev re tac çêdikirin û baz didan hêlekanê. Wan xwe li ber bayê çiyayê Gabarê dihejand. Ew roj gelek xweş bûn, lê wext hespê rewan bû, ew nedigihîştinê. Bi ser van rojên ronahî û wekî avê zelal de ewrên reş dihatin. Dengê kundan dihat ser serê her malekê. Menîfayê çavên xwe digirt ji bo rojên zelal.

Rojekê, hin mirov hatin gundê wan. Gelek dikirin qîreqîr û li her kesî dixistin. Menîfayê li wan dinêrî û di dilê xwe de ji xwe dipirsî "ma dayika wan ji wan re negotibû bi pêlavên xwe ve nekevin hundirê malan. Çavên wan jî wekî yê guran ji Menîfayê re û her kesî re tirs dianî. Wê nedixwest li van mirovan binêre û bêhna xwe teng bike. Car din Menîfayê kirasê xwe yê çekçêkirî li ber bayê li hev bada û ber bi malê ve çû.

Ew mirovên sar hatibûn mala wan jî. Bi pêlavên xwe yên reş ve çûbûn ser nivîn û doşekên wan. Balgî, kulav, merşik, hemû xistibûn nav hev. Dayika wê, xwîşk û birayên wê li quncik disekinîn. Yek ji wan, destê xwe avêt porê wê û got. "bu terorîst pîçî" piştre jî Menîfa ber bi quncik ve avêtin. Ev kî ne, kengê hatine, ji wan çi dixwazin, wan qet nizanibû. Lê awirên wan ên reş ji ewrên reş sartir bûn. Di bin awirên wan ên reş de, Menîfa bi xeyalên xwe re diaxivî. Di xeyalên wê de çûk hatibû ser kulîlka wan. Lê belê ew çûk dinaliya, Menîfayê lê dinêrî, dilê wê bi çûkê dişewitî. Li çavên çûkê nihêrt û danî ser destê xwe. Dema çûk danî ser destê xwe, dît ku striyek di piyê çûkê re çûye û ev strî çûkê diêşîne. Demek darbas nebû, Menîfayê striya lingê çûkê jê derxist û çûk firiya. Çûyîna çûkê, kêfxweşiyek û êş dida Menîfayê…

www.arsivakurdi.org

# Heta ku kurd nebin yek…

**Bi hezaran kes îro di girtîgehan de ne. Îradeya kurdan di destê wan de nîn e, kurd hatine kolekirin, welatê wan hatiye bindestkirin, serokê wan di bin îşkenceyeke bêhempa de ye. Çanda wan û dîroka wan hatiye dizîn û… divê her kes ji bo çareseriya wan bihizire û projeyan bi pêş bixe**

FERHAD URMIYEYÎ

Heta ku kurd nebin yek dê her wisa be… heta ku kurd nebin yek dê kurdên baş û xirab jî hebin, heta ku kurd nebin yek dê kurdên terorîst û kurdên dost hebin, heta kurd nebin yek dê kurdên spî û kurdên hejar jî hebin û…

Bi hezaran salan e ku kurd di vê erdnîgariyê de dijîn û gelek xizmet ji bo pêşketina şaristaniya Mezopotamyayê kirine, gelek bedel dane.

Dema ku mirov berê xwe dide dîroka kurdan gelek tiştên wan yên baş hene ku mirov pê şanaz û serbilind dibe. Lê gelek tiştên wan ên xirab jî hene ku mirov ji wan fedî û şerm dike. Tiştên wan yên baş jixwe baş in. Ew bûne malê hemû cîhanê. Bûne nirxên cîhanşimûl ku mirovahî pê îftîxar dike. Divê ku ev weke pirenîbeke exlaqî bibe malê hemû gelan.

Lê tiştên xirab malê xwediyê xwe ne û dê her pê re bimîne. Her kes bi karneya xwe derdikeve pêşberî dîrokê û li gorî wê hesab dide.

Tiştên xirab ên kurdan pir in. Ew qas pir in ku ev nivîsa kurt nikare mafê wê bidê. Lê ez tenê dixwazim li ser mijareke ku vê nivîsê eleqedar dike rawestim. Ew jî yekîtiya kurdan e.

Dibêjin; rojekê çend kes li qayiqekê siwar bûn û derketin seyranê li ser behrê. Yek ji wan bi bizmarê destê xwe binê xwe kun dike. Hinek ji wan bêdeng dimînin û hinek jî dibêjin; tu çima qayiqê kun dikî? Ew dibêje; bi we çi ez binê xwe kun dikim. Dema ku qayiq kun dibe hemû kesên ku tê de ne di avê dixeniqin û …

Qayiqa kurdan jî kun bûye. Çimkî gelek ji wan binê xwe kun dikin. Heta ku ev kunkirin dewam bike ev qayiq nikare bi silametî ji nav pêlên avê rizgar bibe. Divê her kes bizmarê destê xwe bavêje. Pêdiviya kurdan bi qayiqeke saxlem heye di nav van pêlên xedar de nexwe…


Heta ku kurd nebin yek, zîndan, îşkence, kuştin, talankirin, parçebûn, hejarî, jan, girî, koletî, bindestî û … para wan e.

Heta kurd nebin yek; zilma tirkan, farisan, ereban û dagirkeran dê her hebe. Heta kurd nebin yek, başûrê Kurdistanê, bakûrê Kurdistanê, rojavayê Kurdistanê û rojhilatê Kurdistan jî nîn e. Dê her Bakûrê Iraqê, Başûrê Tirkiyeyê… hebe.

Heta kurd nebin yek dê her tim demxeya serokeşîr, cudakar û terorîst jî her hebe. Heta koletî ji dagirkerên weke tirk, faris û ereb re hebe, kes nikare sibê bersiva pirsên zarokên me jî bide.

Ji bo wê jî heta di konferansa ku dê li Hewlerê pêk were de yekîtiyeke rasteqîn a ramanî, zihnî, giyanî di nav kurdan de pêk neyê û kurd bendê xwe ji dagirkeran qut nekin bila êdî kes qala kurdbûna xwe neke. Lewre jî Konferansa Hewlêrê navnîşana dirustbûna her kurdî ye.

Konferansa Hewlerê azmûna yekem a yekîtiya neteweyî ye. Texteya yekem a qayiqê saxlem e. Divê di vê konferansê de her kes dest ji berjewendiyên takekesî, hizbî, eşîrî, parçe û demî berde. Û bi awayekî kûr û dûr pêşeroja vî gelî hejar û belengaz bifikire.




Bi salan e ku kurd tên talankirin. Bi milyonan kurd koçber û hejar bûne. Bi hezaran gundên kurdan şewitîne. Bi hezaran kes îro di girtîgehan de ne. Îradeya kurdan di destê wan de nîn e, kurd hatine kolekirin, welatê wan hatiye bindestkirin, serokê wan di bin îşkenceyeke bêhempa de ye. Çanda wan, hunera wan, awazên wan û dîroka wan hatiye dizîn û… divê her kes ji bo çareseriya wan bihizire û projeyan bi pêş bixe.

Ev ezmûneke dîrokî ye nexwe em ê bêne lanetkirin. Bila kes neyê lîstikên dagirkeran!!! Bila kes nekeve xefka zaliman. Bila kes birayê xwe nefiroşe çend diravan.

Heta ku kurd di vê konferansê de bi awayekî heqîqî û rast xwe beşdarî konferasê nekin û bi projeyeke piralî û dewlemend ji bo pêşeroja kurdan neyên vir, KURDISTAN dê bibe TIRKISTAN!

Kurd roj bi roj ji hev belav dibin û her tiştê xwe berdidin, vîna wan binpê dibe, evîn û hesreta wan û hedara wan a sedsalan ji ber xeletiyên kurdan bê encam dimîne.

Ev konferans dikare xeletî û êş û jana kurdan hinekî kêm bike. Ev konferans dikare bibe konferansa aştî û demokrasiya kurdan. Ev konferans dikare xeteke sor li ser şer û pevçûnên navxweyî dayne.

Lê belê heta ku yekîtiyek di navbera kurdan de nebe ev jî mîsoger nabe. Eger di vê konferansê de yekîtiyeke kurdan saz nebe êdî kes, wan tiştek nahesibîne û ji wan re rêz raber nake. Lewre jî pêwîst e di destpêkê de ew ji xwe re rêz raber bikin, heta ku dinya ji wan re rêz raber bike. Nexwe hata ku kurd nebin yek...

# Saziyên pîşeyî û têgihîştina me kurdan

F. MELÎK AYKOÇ

Dema em li nêzîkbûna kurdan ya li hemberî partî û saziyên pîşeyî dinêrin, em dibînin ku tênegihîştineke gelekî şaş heye. Ew têgihîştina şaş ne tenê di nava gelê me yê sade de, di nava akademîsyen û rewşenbîran de jî bi awayê nexweşiyeke kronîk rûniştiye. Gelek caran saziyên pîşeyî û partiyên îdeolojîk tên tevlihevkirin.

Her partî xwediyê bîrdozeke taybetî ye. Ew dixwaze wê bîrdoza xwe di encamê de derxîne ser desthilatdariyê û bi civakê bide pejirandin. Kesê bibe endamê wê partiyê, divê li gor rê û rêbazên îdeolojiya wê partiyê tevbigerin. Divê ew wê bîrdozê têke felsefeya xwe ya jiyanê. Di her tevgera xwe de di xizmeta wê de be.

Saziyeke pîşeyî tiştekî din e. Ew ne rasterast birêkxistiniyeke îdeolojîk e. Ew li ser rê û rêbazên demokratîk ji bo parastina maf û berjewendiyên endamên wê pîşeyê xwe birêk dixe. Hemû kesên di wê pîşeyê de dixebitin, ji kîjan partî û bîrdozê dibin bila bibin, gava rêbaza wê saziya pîşeyî bipejirînin, dikarin bibin endamên wê saziya pîşeyî. Endamê saziya pîşeyî dema di platformekê de saziya wê pîşeyê temsîl bike, divê li gor rêbazên wê saziya pîşeyî tevbigere. Lê wekî din azad e, dikare li gor bîrdoza xwe ya kesanî tevbigere. Em wekî mînak saziya pîşeyî ya mamosteyên alman GEW bigirin.

Di nava vê saziyê de ji her partiyê alman hene. Yanê endamê SPD, CDU, CSU, FDP, Die Linke, Grûnê û hwd. Giş dikanin bibin endamên GEW'ê. Dema ku ew bi navê GEW'ê diçin platformekê li gor rêbazên GEW'ê tevdigerin. Lê kêliya ku bi navê partiyên xwe jî diçin platformekê li gor bîrdoza partiyên xwe tevdigerin. Dikarin li gor bîrdoza partiyên xwe di rojnameyan de pexşan û gotaran jî binivîsin. Ev ne pirsgirêka GEW ye.

Ev şert û şirûtên saziyên pîşeyî li her derê cihanê wek hev in. Divê li gel me jî wiha be, ku ez bi xwe wiha têdigihîjim. YMK saziyeke pîşeyî ye û li gor vê rêbaza navnetewî tevdigere. Her mamosteyê kurd yê ku rêbaza (destûra) vê saziya me bipejirîne, dikare bibe endamê/a vê saziya pîşeyî. Bi gotineke din mamosteyek endamê PDK, YNK, PKK, PSK, PIK ûhw. Dikare bibe endamê YMK ango rê ji her mamoste û hîndekarê kurdî re vekirî ye. Ew dikarin jiyana xwe ya siyasî bidomînin, di rojnameyê xwe de jî binivisînin, lê gava bi navê YMKê jî çû platformekê, divê tenê li gor rêbaz û armanca YMK tevbigere. Bi zimanekê vekirî, mamoste Fêrgîn, mamoste Fetah, Mamoste Emîn, Mamoste Suleyman, Mamoste Yusuf, Ma… dikarin li gor dîtinên xwe yên cihanî di cûre cûre rojnameyan de li gor dîtina xwe ya cihanî binivisînin. Lê ne bi navê YMK'ê, gava bi navê YMK'ê nivisîn jî, divê di nav çarçova rêbaza wê saziyê de binivisînin. Wek mînak; ev nivîs di nava vê çarçoveyê de hatiye nivisandin.

Her çendî her tişt zelal in jî, dîsa di nava me kurdan de têgihîştinên şaş hene. Ev ne tenê di vî warî de di her warê jiyanê de jî wiha ye. Gelo ev ji ku tê? Mirov dikare bi kurtî egerê vê wiha bîne ziman:

Kesên pêvajoya netewbûna xwe nejîn, li gor felsefe û politika perwerda netewa xwe neyên perwerdekirin, hemû cemkên netewî di bîra mêjî de nedabin rûniştin, serbilindî û serfiraziya netewa xwe neçêştandibin, nikarin di tu warî de bikemilin. Lema di mijara saziyan de jî nîv û nîvco ne. Genim û xisarê tevlihev dikin.

Gava em ji bo têgihîştinê vê mijarê hinek vekin, dê rastî bi awayekî hê zelaltir derkeve pêş me. Min di gotara xwe ya bi sernavê "Kurd û netewperestî?" de mînaka almanekî dabû, em wê mînakê li vir jî bidin:

"Almanekî/ê çawa tê cihanê, dengê muzîk, axaftin û qîjevija almanî, dengê xişîn, ringîn û çingîna amûr û lîstokên almanî dikeve guhên wî/ê; şîr û mamayê fabrîqên alman ve/dixwe. Bi mezinbûnê re bernameyên zarokan ên li gor bîr û baweriya almanan amdebûyî dibîne. Ji bistanê zarokan hetanî zanîngeheke diqedîne di perwerdeyeke li gor felsefe û polîtika netewa alman re derbaz dibe. Di rojên netewî, maç û olimpiyatên navnetewî de bi mezinan re wê kelecan û dilhejiya serkeftina netewî dijî. Her warê jiyana bav û kalên xwe di muzeyan de dibîne. Bê vê di her karê rojane de van karekterên almanan ji xwe re kirine mal, wek; heredarî, teknîk, daqîqbûn, dilpêtî, hevperestî, bipergalbûn ûwd. dibihîse, dixwîne, dibîne û dijî. Bi gotineke kurt; ev kesayetî êdî di pîleyeke heri berz de netewbûna xwe di her şaneyê xwe de bi awayekî perçîmkirî radibihîse û diçêştîne."

Ji ber vê egerê jî alman dikarin di her warî de serkeftî û bi xwe bawer bin. Saziyên wan sazî ye, partiyên wan jî her wiha. Lê em kurd?

Em li welêt li ser bingehê netewbûna welatên koloniyalîst dixwînin û dikemilin. Li dervayê welêt jî di nava sê çar çandan de wenda dibin. Lema, yê ku bi tirkî dibistan qedandine nikarin bê kêmasî gotareke tirkî binivîse. Yê zanîngeha almanî qedandî, nikare protokoleke bi almanî formule bike. Ev de nivisandina kurdî de jî, wiha ye. Camêr rojnamewaneke kurdî ye, lê bi mêjiyê tirkî dinivîse. Hin mamoste henin nikarin pexşaneke li gor rastnivîsa kurdî binivîsin. Dibin endamê saziyekê, lê wateya sazî û erkê saziyê tênagihîjin. Ez dixwazim mînakeke balkêş bidim:

Di sal 2002'an de min serî li saziya yekitiya mamosteyên kurd yê li Niedersachsen KOM-MAK'ê da û min xwest ku ez bibim endamê vê saziyê, lewra min jî li Niedersachsenê mamostetî dikir. Li ser daxwaziya wan ez çûm kongreyê. Serokê KOM-MAK birêz Alî Beltir daxwaziya min pêşkêşê kongreyê kir. Her çendî ez ne endamê partiyeke siyasî jî bûm, endamekî Komîta Rêvebir ya wê kêliyê bi wî çavî li min nêrî û bi dehan pirsên îdeolojîk û polîsîye ji min kir. Mirovan digot qey partiyeke îdeolojîk e û xwerexneya min dixwaze. Di encamê de endamtiya min hat pejirandin. Ew endamê Komîta Rêvebir, yê ku pirsên polîsîye ji min kiribû, bi endamtiya min re tiştên din kir bahane û ji KOM-MAKê qetiya, ji bo ku vê saziya pîşeyî di çavên almanan de bixe, yan jî daxîne sewiya rêkxistinek terorîst, her çendî têkiliya vê saziya pîşeyî bi tu rêxistinê re tune jî, bi derewan ev sazî bir, bi partî, saziyê din ve girêda. Lê sipas ji serokê KOM-MAK'ê Alî Beltîr re ku di warê erkê sazîbûnê de ew pir têgihîştiye, wî pêşî li vê xinizî û bêbextiyê girt.

Ango ev mînak bi serê xwe vê nexweşiya xwe û netewbûna xwe nejiyanê bi awayek kronîk derdixe pêş. Hêviya min ew e. ku ev nîvîs di vî warî de bikare bibe pîpilikeke têgihîştinê. Her mamoste di nava vê çarçovê de li saziyê binêre, daku em jî wek gelen din bikarin saziyên bi rastî erkê pîşeyî wergirtine di qada jiyanê de bidin rûniştin.

# Îsmet Berkan û Martîn Luther Kîngê Kurdan

LERZAN JANDIL

Ez bawer kena balê wendoxanê rojnameya ma kî anto, ke ez, eke zaf muhîm mebo, nivis û vatişê kesan ser ro nênivisnena. Çike bingeyê nivisanê mi vatiş û şaşîyê kesanê bînan niyê. Bingeyê nivisanê mi, tecrube, zanayiş, bawarî û waştişê mi bi xo yo.

Nê nivisanê muhîman ra yew kî hetê Ismet Berkanî ra rojnameya Radikal de roja 11.4.2009 de binnameyê "Martin Luther Kingê Kurdan…" de amê bî nivisnayene.

Berkan nê nivisê xo de vatişo ke Ahmet Türkî Obamayî ra vat bî "Hewnê Martin Luther Kingî Amerîka de bî raştîye. Ma kî wazenîme hewnê Kurdan yê kultur û kesîtîye bêro dîyene" reyneno/tekrar keno û nîya vano: "La belê meselayêde muhîme esta: Tawo ke Amerika de çermesîyayan, seba wayirê heqanê xoyê medenîyan bîyene, seba hemwelatîyanê wayirê eynî heqan bîyene tekoşine dêne, hama hama qet pêşkarê şîdetî nêbî…Duştê naye de tawo ke meselaya Kurdan ra êno qesê kerdene sareyê ma kuno têmîyan. çike ´meselaya Kurdan terorî ra cîya kerdene zor a. Hetanî merdim şikîno nîya kî bivajo, ´şîdet parçeyêde meselaya kurdan o, ke nêno cîya kerdene wo. çi hêf ke yew Martin Luther Kingê Kurdan nêbî." ... Nîyadê, merdimanê ke ez şinasnena re tewr aşîtîwaştox Ahmet Türkî kî, binê tesîrê ziwanê şîdetî de ro…" û dewam keno.

Tawoke merdim nivisê Berkanî rind biwano, vîneno, ke Berkan Matin Luther Kingêde Kurdan nêbîyene de hurêndîya dewlete de Kurdan keno guna kar û . barî dêm dano kurdan ser.

Eke merdim meseleyan de xorî niya medêro, sebeb û şertanê demî miyaro re çiman ver, beno, ke merdim heqe bidêro Berkanî.

La belê mesela sey re ziwan ardişê Berkanî niya.

Na mesela de Berkan ya dîroka Tirkîye de bi çimanê serdestanê Tirkîye nîya dano. O dîroka Tirkîye de bi çimanê bindestanê Tirkîye yanê karkeran, demokratan, çepan û bi çimanê Kurdan niya nêdano.

Yan kî derheqê tekoşina Kurdan de çundeyê zanayişê Berkanî kaleka îdeolojîyê fermî de, raporê îstîhbaratî, qerarê mahkemayan û îfadeye polêsan ê. çike hênî aseno ke xebera Berkanî tekoşin û dîroka Kurdan çîna.

Huna ke mi dîroka Kurdan de tekoşina bê şîdetî ser ro çîyê nêvato, ez wazena noca çîyêde balkêş bivajî.

Her kes Nelson Mandelayî şinesneno û derheqê tekoşina ey de wayirê agahdarîyan û wayirê fikiran o.

Nelson Mandela otobîografîyê xo de derheqê şîdetî de nîya vano: " Seba şîdetî dewlete verpersîyar a û formê, şeklê cengî bindestî nê, tim serdestî/koledarî dîkte kenê. Eke serdestî şîdet bixebetnê, bindestan re xêca reaksîyonêde bi şîdetî weçînitişêde bîn nêmaneno. Halê ma de no xo parzenayenêde legîtîme bîye."

Seke noca de Mandela kî vano: "Formê cengî hetê serdestan ra êno kifşe kerdene. Eke serdestî duştê bindestan de metodanê bê şîdetî bixebetnê, o taw bindestî kî metodanê bê şîdetî xebetnenê. Nê, eke serdestî şîdet bixetebne, bindestan re rayêde bîne nêmanena û no şîdetî kî beno yew reaksîyonê bindestan yo legîtîm."

Yanê noca de şîdet xebetnayene de kêmasîye, qusur, guna, verpersîyarîye ê bindestan nîya, ê serdestan a.

Meselaya Kurdan de kî, sebebê şîdetî xebetnayene Kurdî niyê, dewleta Tirkîye bi xo ya. Tirkîye ne tenya duştê Kurdan de, duştê her kesî de şîdet xebetnena. çike amênê avakerdişê dewleta Tirkîye bi şîdet û teror amo ci eştene û Tirkîye dewletêde şîdetparêz a.

Rojvejê mîyanî de sey yew metodî çareserkerdena probleman de xebetnayena şîdetî, Dîroka tekoşina Kurdan de cayê şîdetî ser ro heştêna vindena.

www.arsivakurdi.org

Rupel 9++++++:Layout 1 19.04.2009 15:59 Page 1



# Xelata ziman Turk wergirt



**Enstîtuya Kurdî îsal xeleta xwe ya 5'emîn a Zimanê Kurdî da Hevserokê DTP'ê Ahmet Turk. Turk got ku hunermend û wêjevanên kurd ji bo zimanê kurdî xebatên gelek girîng meşandine û xebatên niha berdewamiya xebatên wê demê ne**

5'emîn Xelata Zimanê Kurdî ya ku ji aliyê Enstîtuya Kurdî ve her sal tê dayîn, îsal hêjayî hevserokê DTP Ahmet Turk dîtin. Di 17'emîn avakirina Enstîtuya Kurdî de ji bo bîranîna Feqe Huseyîn Sagniç resepsiyonek hate dayîn. Resepsiyon li Navenda Çanda Mecîdiyekoy hate dayîn û hevserokê DTP'ê Ahmet Turk, parlamenterê DTP'ê yê Muşê Sirri Sakik, parlamenterê Sêrtê Osman Ozçelîk, Murat Batgî ku di bin banê NÇM'ê de xebatên xwe dimeşîne, serokê DTP'a Stenbolê Halîl Aksoy û nûnerên DTP'ê, hevsera Feqe Huseyîn Sagniç Rabîa Sagniç û kurê wî Ferhat Sagniç tevli resepsiyonê bûn. Ligel van jî gelek kes tevli resepsiyonê bûn.

Resepsiyon bi rêzgirtinê dest pê kir û serokê Enstîtuya Kurdî Samî Tan axaftinek kir. Samî Tan diyar kir ku di demên dawî de operasyonên ku li ser DTP'ê pêk tên, pir vekirî derdixe holê ku li hemberî kurdan bêtehamuliyek heye. Tan wiha berdewam kir: "Ev zext û zordarî dê têkoşîna gelê kurd têk nebe. Pêkutiyên li ser zimanê kurdî heta niha her tim berdewam kiriye. Ev demeke dirêj e em der barê zimanê kurdî de xebatên xwe dimeşînin. Di encama vê de niha em dikarin li Stenbolê li 20 cihên cuda perwerdehiya zimanê kurdî bidin. Kadroyên me hene."

**Kurd bi bedelan hatin vê rojê**

Piştî axaftina Samî Tan, sînevîzyonek ku jiyana Feqe Huseyîn Sagniç vedigot hate nîşandan. Piştî sînevîzyonê hevserokê DTP'ê Ahmet Turk jî bo ku 5'emîn Xelata Zimanê Kurdî bigire derket ser dikê. Turk xelata xwe ji destê hevsera Feqe Huseyîn Sagniç, Rabîa Sagniç girt. Ahmet Turk diyar kir ku hunermend û wêjevanan ji bo ku ziman û çanda kurdî bijî gelek xebatên girîng meşandine. Turk wiha dirêjî da axaftina xwe: "Ev xebatên niha berdewamiya xebatên wê demê ne." Turk li ser pêkutiyên li ser gelê kurd tê meşandin sekinî û destnîşan kir ku gelê kurd bi ked û bedelên mezin hatiye vê rojê. Tu kes jî nikare têkoşîna gelê kurd asteng bike. Tu kes nikare gelê kurd bide sekinandin. Bila her kes baweriya xwe bi vê yekê bîne. Ew nikarin kurdan bi zext û operasyonan bi dawî bikin. Gelê kurd dê winda neke, hûn ê winda bikin." Kurê Sagniç, Ferhat Sagniç axivî û destnîşan kir ku axaftina Turk ya meclîsê dîrokî ye û hêjayî xelata zimanê kurdî ye. **STENBOL**



*Peyvên Nepenî*

**Kakşar Oremar**

*kakshar_oremar@yahoo.de*

## Rêbaza DTP'ê û serkeftina kurdan

Çend roj in ku li bakurê Kurdistanê û Tirkiyeyê li dijî doza kurdan liv û lebateke mezin dest pê kiriye. Girtin, binçavkirin, tawanên bi navê terorê û aligîriya terorîstan di medya tirkan de tev bûn manşetên sereke. Bi vê re em kurd jî gerek ji bîr neken ku: Parêzvanên sîstema kemalîzmê û rayedarên dewleta îro li Enqereyê teva destê xwe dane hev ku nehêlin kurd bi îradeya xwe ya hesinîn êdî heta santîmetreyekê ji ber bi pêşvetir pêngava hilînin. Generalên artêşa Tirkiyeyê bi riya kuştinê, kemalîstên cinayetkar bi înkar û siyaseta xwe ya asîmîlekirinê û AKP'yiyên ku bi navê îslamê sextekariyê dikin, teva destê xwe dane hev ku dîsa jî nehêlin kurd di vê sedsalê da negehin daxwazên xwe yên dêrîn. Ev kar û siyaseta wan a çewt îro li başûr, rojava û rojhilatê Kurdistanê jî tê dîtin. Ji bo sekinandina çerxa vê hereketa mezin ew ê hemû îmkanên xwe bixin gerê, lê xwediyên doza Kurdistanê yên rastîn jî nahêlin ew bi ser bikevin.

Di hilbijartinên 29'ê Adara îsal de kurdan: Îrade, hêz û yekbûna xwe ji her kesî re eyan kirin. Kurdan bi vêra pêşkeftineke mezin di rûpelên dîroka xwe ya siyasî da tomar kirin. Çimkî ev serkeftin çend alî bû: Hem di qada civakî, hem di warê siyasî û hem jî guherandina di zihniyeta gel de serkeftineke wiha ne tenê rayedarên komara Tirkiyeyê, belkî dagîrkerên parên din ên Kurdistanê jî xistin nava tirseke mezin.

Hewldanên wiha ji hêla Tirkiyeyê ve tevî ku antîdemokratîk in jî, lê ez keyfxweş im ku ew bi taybetî li bakurê Kurdistanê wiha bi kîn li dijî kurda tev digerin. Sedem: Sedam Husên jî li dijî kurdan çi hovîtî neman ku nekirin. Enfal, windakirina 185 hezar kesan û jenosîda li Helepçe teva destê xwe dan hev û me dît ku qedera dîktaorekî xwînmêj bû çi. Li bakurê Kurdistanê tenê bi Ergenekonê 17 hezar kes winda ne. Çendîn hezar kesên din di şer de hatine kuştin. Gund, daristan û bajar hatine şewitandin û wêrankirin. Rewşeke wiha li başûrê Kurdistanê jî hebû. Niha ger em tenê Ergenekon û jiyana 17 hezar mirovên bêguneh bînin ber çavan, yê hingî aşkera bibe ka terorîst kîne û cinayetkar li ku ne. Êdî wijdanên nivistî jî ji xewê rabûne. Ferqa dîktatora di qirkirina mirovan de tune. Sedam, rayedar û generalên faşîst li Tirkiyeyê, Baasiyên tawanbar li Sûriyeyê, Xamêniyê û Ehmedînejadê radîkal û fenatîk tev li dijî me yek in. Berê jî ew tev di deravên teng de li dijî me yek bûne, lê mixabin em hê li çar parçeyan nebûne yek. Vê carê li bakurê Kurdistanê yekbûna kurdan hikûmeta Tirkiyeyê dîn kiriye û mesajeke mezin jî daye Îran, Sûriye û Iraqê.

Tirk dixwazin bi liv û lebatên li dijî DTP'ê mesajên tirs û wehşeta salên berê bi bîra kurdan bibin. Lê bawer nakim û yê tiştekî li dijî felsefeya diyalektîkê be ku êdî kurd ji ya xwe bêne xwar û tiştên bi dest xistine careke din ji dest bidin. Di dîrokê de dijminê kurdan ê herî xedar komara Tirkiyeyê bûye, lê xwîn û keda ciwan, dayik, keç û şervanên şoreşa azadiyê di taliyê de ew xistine ser çoka. Êdî kurdan bersingê tirkan girtine û mafên xwe dixwazin. Wan bi hinek pêngavan bi awayekî nefermî hebûna kurdan pejirandine, lê li ba me kurdan ev hê „lêlê ne, lolo hêşta mane". Tirk jî ji „Loloyên" me kurdan ditirsin û zextên îro jî ji vira tên. Ev zexta ku îro li dijî DTP'ê heye yê tev bibe sebeba xweşî û çirandina perdeyên reş ku hîna mane. Elbete hîna nebûye dereng derfet û îmkaneke mezin li ber dagirkerên Kurdistanê heye ku banga kurda ya aştîxwazane bi awayekî pozîtîf binirxînin û bersivê bidinê. Tayip Erdogan di mesaja xwe ya piştî serkeftinên li bakurê Kurdistanê îşare bi xaleke girîng kiribû û behsa pirsgirêkên etnîkî kiribû. Bi wê hêvîyê ew baştir û kûrtir li ser vê pirsgirêkê lêkolînê bikin. Çimkî kurdan ne tenê li bakur belkî li parçeyên din jî bûne xwedyê yek îrade û çavên teva li bakurê Kurdistanê ye.

## 14'emîn Fuara Îzmîrê hate vekirin

Fuara Pirtûkan a Îzmîrê bi hevkariya TUYAP û Yekitiya Weşangeriyên Tirkiyeyê cara 14'emîn hate vekirin. 14'emîn Fuara Pirtûkan a Îzmîrê bi toreneke vebû. Fuar li Kulturparkê hate vekirin. Di torenê de koordînatorê Giştî yê TUYAP'ê Denîz Kavukçuoglu axivî û diyar kir ku dê 306 weşanxane û 93 nivîskar tevli fuarê bibin.



Kavukçuoglu destnîşan kir ku di fuarê de gelek weşanxaneyan ji sedî 30'î buhayê pirtûkan kêm kiriye. Kavukçuoglu wiha dirêjî da axaftin xwe: "Pirtûkên gelek xweş li benda xwendevanên xwe ne. Her wiha dê gelek nivîskarên navdar jî beşdarî fuarê bibin û bi xwendevanan re bêne cem hev. Îsal dê 9 rojan bidome û dê bi gotar, panel, helbest û şahiyên zarokan berdewam bike. Mêvanê rûmetê yê fuarê jî îsal Tarik Dursun K. ye." Piştî axaftinan Fuara Pirtûkan a Îzmîrê bî torenekê hate vekirin. **ÎZMÎR**

## 'Kurdland' li Munsterê hate nîşandan

Belgefîlma bi navê 'Kurdland' li bajarê Munster a Almanyayê hate nîşandan. Wezîrê Çandê yê Hikûmeta Federal a Kurdistanê Falakaddîn Kakeyî û derhênerê belgefîlmê nivîskar Hassan Îrandost jî tevli galayê bûn. Spyros Marînîs belgefîlm pêşkêş kir û her wiha hunermend Şivan Perwer û Muzîka Emsemble Stranên Rojê jî muzîka xwe pêşkêşî temaşevanan kir. Belgefîlma bi navê Kurdland ji aliyê Urumfîlm hatiye amadekirin. Di belgefîlmê de li başûrê Kurdistanê jiyana beriya rejîma Sedam û piştî Sedam tê vegotin. Kurdland bi piştgiriya Meclîsa Biyaniyên Munsterê li Ewropayê cara yekemûn hate nîşandan. **MUNSTER**

## Panela pedagojiya bi kurdî

Şewirmendê Psîkolojiyê Ramazan Pertev yekemîn 'Pirtûka Zarok û Çîrok Despêka Pedegojiya Kurdî' ku têkildarî pedagojiyê agahiyan dide bi panelekê da nasandin. Pertev diyar kir ku pedagojî zanista mezinkirina zarokan e.

Şewirmendê Psîkolojiyê Ramazan Pertev pirtûka xwe ya bi navê, "Pirtûka Zarok û Çîrok Despêka Pedegojiya Kurdî" bi panelek li Navenda Çanda Amedê hate pêkanîn de da nasîn. Nûnerên Komelaya Nivîskarên Kurd ya Swêdê, Tev Kurd, KURDÎ-DER, gelek nivîskar û hemwelatî beşdarî panelê bûn. Pertev di panelê de yekemîn pirtûka pedagojiyê ya kurdî da nasandin û diyar kir ku pedagojî zanista zarokan e. Perdev wiha axivî:

"Pedagojî ji pêvajoya zayinê heta ya kamiliyê digire nav xwe. Mijara pedagojiyê zarok e û hemû karên zarokan ên malbatî û çandî digire nav xwe. Her pergal ji bo xwe bi rê ve bibe mekanîzmeyek perwerdehiyê li ser pedagojiyê ava dike. Bi vê riyê dihêlin ku pergal xwa ava bikin û bir rê ve bibin. Di nav netewdewletan de pirsa sereke ew e ku 'Ka em dê zarokekî çawa mezin bikin?' Lê em kurd ji ber bêpergaliyê nikarin bêjin ka em dê zarokan çawa mezin bikin."

**30-40 milyon kes diaxive**

Pertev, li ser mijara ziman jî destnîşan kir ku kurdî di nav zimanên cîhanê de zimanekî îstisnaî ye û wiha domand: "Ligel ku nebûye zimanê fermî jî ji aliyê 30-40 milyon kesî di jiyana rojane de tê bikaranîn. Ligel kurdî ne fermî ye jî di nav 30 zimanên cîhanê yên sereke de, di rêza 31'an de ye. Bi kovar, rojname û hemû zaravayên xwe wiha ye û bi taybet pêşketina zarava soranî û yên din dilê mirov şanaz dike."

Têkildarî mijarê Pertev derbirî ku mekanîzmaya hucreyên mêjiyê zarokan ku beriya 5 saliya wan çiqas were tijîkirin ewqas cih tê de heye û sînorê fêrbûyîna zarokan tune ye.

Pertev, anî ziman ku heta 5-8 saliya xwe zarok dikarin heta 10 zimanan fêr bibin û wiha pê de çû: "Her wiha ji ber ku kurdî zimanekî istisnaî ye pêwist e di nav mal de hîn bibin. Ku malbatên bi kurdewariya wan ne li pêş bin mala zarokan xirab dibe. Bi taybetî ji ber ku zarokên kurd dizanin ku zimanê wan xedexe ye bi zimanê xwe fêr nebin û ji xwe bêbawer mezin dibin." Li ser mijarê Pertev, anî ziman ku di nav gelên bindest de nexweşiya xerabiya fêrbûyîna zimanê tevlihev pêş dikeve û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Ku li wir çandek serdest hebe ew çanda niştecihan lawaz dike.

Çawa werger zimanan pêş dixe, dibe bela serê ziman jî. Bila saziyên me dest bavêjin pedagojiyê û malbatan di vî alî de perwerde bikin. Lazim e malbat zarokan bi çîrokên cin û pîrebokan mezin bikin.

Zanyar xwendina çîrokên zarokan ji bo pêşketinê pêwist dibînin. Lazim e ku kurd jî çîrokên xwe sererast bikin." Panel bi beşa pirs û bersivan bi dawî bû. **AMED**



Rupel 10:Layout 1 19.04.2009 14:31 Page 1



# Riyên welatê min

HALÎL DAG

Rê, cih û mekanên seretayî ne ku em xwe û hevûdin lê nas dikin. Tenê bila em biryarê bidin ku carekê bimeşin û dest bi wê gava yekemîn bikin. Tenê bila em biwêrin li rê binêrin.

Em, ji mekanê em lê ne, veqetandinê xeyal bikin. Bila carekê heyecana dîtin û kifşkirinê bikeve nava me. Bila carekê em biryara lixwegerînê bidin û bikevin ser rê. Hingê wê rê, bi hemû dilovaniya xwe li ber me dirêj bibe. Ji ber ku rê, tu carî tu kesî red nake... Belkî jî rê, tekane mekane ku me gişan hembêz dike û mirov vediguhezîne…

Gelo ji kifşkirina xwe bi xwe bedewtir tiştekî din heye? Li ser rûyê erdê, ma ne cewherê herî xweşik mirov bi xwe ye? Ma di jiyana me de rêwîtiya herî xweşik, ne ew rêwîtiye ku em di nava xwe de dikin?

Heta niha em tu carî nemeşiyan? Di bajarên beton de, rêwîtiyên ku her carê mirov gêj dike, ne rêwîtiyên me bûn. Û tu carî em negihandin me. Li wan bajarên ne yên me bûn, me tim ji dûr nêrî. Em biyanîbûn li gişan…

Heke di hilatina rojê de em ji deriyekî derdikevin û di avabûna rojê de jî em tên ber heman derî disekinin, hingê ev wêneyê me ye ku em nameşin.

Her gerîlayê ku tê çiyan, azara meşa yekemîn dikêşe. Her gaveke ku hûn diavêjin azarên ku mirov deyax nake li bedena mirov digere. Mirov şaş dimîne ku lingên me ew çend bêhêz in. Hingê mirov fêm dike ku li ser zemînên beton em hatine xapandin. Ango em li wir nemeşiyane.

Rojên yekemîn ên em li çiyan dimeşin, lingên me, mil û baskên me, êşeke nayê deyaxkirin, tam dike. Di her gava em diavêjin de, hemû bedena me di nav êş û azaran de dimîne.

Mirov wisa hîs dike ku wê her tişt wiha bidome. Em dibêjin qey wê her dem wiha dewam bike. Mirov li rêzeçiyayên li ber me dirêj dibin, dinêre û difikire emê nikaribin bi ser bikevin.

Lê ya rastîn li ser van riyan, hemû barên ne yên me ne, yek bi yek ji me têne xwarê û ber bayê dikevin. Di dirêjahiya şivîleyan de, hemû maskeyên ku em li xwe dikin, dadiweşin ji me. Li qûntara van çiyan, jiyana ku bi salan em hatine hînkirin, em ber didin û davêjin. Her ku di riyên çiyan de dimeşin, em hîs dikin ku bedena me parçe parçe ji me vediqete. Her ku em dimeşin em dibînin ku ew qaşilê giyan ên bedena me pêçane, parçe dibin.

> Her ku di riyên çiyan de dimeşin, em hîs dikin ku bedena me parçe parçe ji me vediqete

Her ku em dimeşin, em hîs dikin ku em ji hin deveran dûr dikevin. Em dimeşin û em dibînin ku em hin tiştan li dawiyê dihêlin. Ev tunebûna me ye.

Bi meşê re em hîs dikin ku em nêzî devereke din dibin. Her ku em dimeşin em dibînin ku tiştên din li ruh û bedena me zêde dibin. Ev jî peydabûn û zayîna mirov e.

Her ku ji me, ji bedena me û ji ruhê me hin tişt qut dibin, hin tişt jî bi ser me ve dibin û li me zêde dibin. Ling û destên me li teht û terîşan dikevin û xwîn ji wan tê…Destên me li diriyan dikevin, diqelişin.

Strî û dirî rû û destên me didirînin, birînan vedikin. Westan xwe li bedena me hemû dipêçe. Ew kêliya ku em difikirin her tişt bi dawî bûye, em xwe davêjin hevalên xwe.

Yek ji wan di tariyê de bi destê me digire û hêdî hêdî me dimeşîne.

Yekî din jî nanê xwe bi me re parve dike û qurtek avê li ser lêvên me dihêle...

Rêya em tê re dimeşin digihîje rûbarekî û em nikarin derbasî aliyê din bibin. Her kes xwe çip dike û derbas dibin diçin. Em tu awayî nikarin biryar bidin ji bo xwe çip bikin. Em ji lingê xwe piştrast nînin, em ji xwe piştrast nînin.

Yên li aliyê din destên xwe dirêj dikin û bang li me dikin. Em radiwestin hêz û cureta xwe hemû didin ser hev, hilma xwe dikişînin û ji nişkê ve xwe çeng dikin. Em dibînin ku em derbasî aliyê din bûne. Me xwe çip kiriye, em jî bawer nakin...

Em pêşî his dikin ku lingên me guherîne. Di şevên tarî de xwe bi xwe dikarin rêya xwe bibînin. Em bawer nakin ku gelo ev ling ên me ne...

Çavên me êdî her tiştî dibînin, guhên me xêşînan hemûyan dibihîsin. Piştî bedena me, dilê me jî diguhere. Xeyal û hesretên me jî diguherin. Em êdî xeyalên xwe di xewnên xwe de dibînin.

Em êdî bedena xwe bi rastî his dikin. Ha êdî em em in. Êdî ruhê me ji qalikê xwe derketiye û ji leleyên xwe rizgar bûye. Êdî xewn û xeyalên me yên me ne. Û her wiha êdî ev rê rêya me ye.

Ewê me bigihîne aso û hêviyên nû. Em dema bi heyecan di riyên çiyan re bimeşin, emê aso û hêviyên welê bibînin ku me berê hîç di nav avahî û apartmanên betonda de nedîtine. A wê demê emê hîn bibin aso xetek nîne ji dûr ve xuya dike.

Em her hildikişin, em dizanin ku aso rewşek xwe heye li benda keşifbûnê ye. Her çiyayekî nû em pê radipelikin û hildikişin, aso û hêviyên nû pêşkêşî me dike. Ji lewra her roj avabûn li van çiyan xweser û taybet e.

Tu roj naşibe ya din û tu roj wek ya din bi dawî nabe. Tu tişt li vir xwe dubare nake. Ji ber ku me keşif kir ku li pişt her çiyayê em hildikişinê asoyeke nû heye.

Em kurd hînê meşeke nû dibin. Em nû keşif dikin ku çawa mirov gav diavêje û ber bi pêş ve dimeşe. Em yekemîn car çêkirina rêya xwe diceribînin û li ser dimeşin.

Piştî hezaran salan ku em li van kolanên şaristaniyê geriyan, em niha ji vê labîrentê derdikevin. Em yekem car xwe ji labîrenta xwe xilas dibin û cara pêşîn li asoyên xwe dinêrin.

Û êdî em nikarin ji rê, ji aso û ji awirên xwe bigerin.



## Çend name ji deryaya dilanê

*rawestan mirin bi xwe ye!..*
*min bi her du çavên xwe dît*
*ewên rawestiyan*
*ketin nava lepê goristanan*
*bêdem û wext;*
*û ez naxwazim bimrim niha*
*Ezîzam!..*
*Çend kêlikan berî niha bû; dîsa*
*hatin û belav bûn li ser asîmanê dilê*
*min xewn û xeyalên min. Destên min*
*bêyî daxwaza min berê xwe dan*
*berîka*
*êşlikê min û ji nişka ve min dît ku*
*pênûseke rengxweşik di nava her du*
*tiliyên min de ye…*
*Û min Ezîzam!..*
*min kir û nekir*
*li min nebûn mêvan çend gotin*
*gava ku min hilgirt nava her du*
*tiliyên xwe*
*pênûseke hubirşîn!...*
*qeşem girtibû niha rûbarê dilê min*
*laşê min Sibirya ditirsand*
*bi awirên sar û cemidî;*
*bi tembûra têlzirav ket*
*her du çavên min ji nişka ve,*
*deng vedida heçko li ber guhên min*
*stranên çend dem û zemanên windayî,*
*ketin ber awirên min hingê*
*xeyalên gelek ji min dûr,*
*xwe berda ser deşt û zozanên dilê*
*min*
*nermebayekî çiyayî,*
*û hingê;*
*hestên min hilçûn hingê bêyî xwe*
*û*
*herikîn ji hubra dilê min*
*çend gotinên biefsûn:*
*dem dibore bêdaxwaza min*
*kêlik xwe digihînin hûrdeman*
*hûrdem didin pey saetan,*
*saet rojan dibezînin*
*roj meha radikin çargavan*
*ez pêdihesim wê gavê*
*dem hespekî bêlixav e,*
*demsal diherikin bilez û bez*
*sal diborin li pey salan*
*mîna rûbarekî dîn û har*
*û*
*ez dikevim ber pêlên wê,*
*çend bihar tên dizîn*
*ji salnameya umrê min,*
*bayekî sarogerm*
*xwe li dilê min dide*
*bi dizîka ve*
*wek bahozekî bênav û nîşan*
*goristan tên bîra min ji nişka ve*
*lê vaye ez dimeşim hê!..*
*narincok diteqin yekoyek*
*li her derê sîngê min*
*xwe li çavên min didin moşeng*
*û teyare difirin*
*ligel firokên xeyalkuj*
*li ser asîmanê dilê min*
*şer û ceng xwe hiltavên*
*li peravên awirên min*
*bedenê min parçe parçe dibe*
*goristanên nû ava dibin li her*
*parçekî*
*disojim, dikelim, dihelim*
*çiya diafirin ji xweliya min*
*kes nayê hewara min*
*ne yar xuya ye, ne jî hevalên min*
*şevereşk êrîşan tînin*
*ser xewn û xeyalên min*
*lê vaye ez dimeşim hê!..*
*evîn direve ji min*
*çiqas lê digerim jî*
*hêvî xwe vedişêrin ji cotstêrên min*
*çend dindikên ronahiyê jî*
*xwe bernadin ser hinarokên min*
*her du lêv ziwa dibin*
*dicemidin awirên min*
*pêdihesim careke din*
*li dora min digere*
*ew mêvanê xêrnexwaz*
*xwe berdide dilê min hilma mirinê*
*min bi tenê dihêlin xewn û xeyal*
*bêhal dibim*
*bêmecal*
*bêdost û yar diminîm*
*bêhogir û heval*
*lê vaye ez dimeşim hê!..*

**HEMÎD DILBAHAR**

www.arsivakurdi.org

# Edî kes nikare goştê me bi hev bide xwarin

MUSA ANTER

Edî kes nikare goştê me bi hev bide xwarin  Bi sedsalan, fêleke dijminên kurdan hebû, em berdidan hev. Ew qasî em parçe kiribûn ku her eşîreke kurdan jî kiribûn dido, sisê. Mesela di Kurdistanê de piştî eşîra Barzaniyan, eşîra Omeriyan tê. 90 gund in, ji Luksemburgê mezintir in. Lê hikûmeta Osmaniyan û dûre TC ev eşîr parçe-parçe kiribû û kiribû dijminên hev. Mehmûtkî û Etmankî tevli axayên xwe giş lawê apên hev bûn, lê tev dijminên hev bûn. Wek Mala Osman, Mala Silêman, Mala Smaîl û Mala Tahir.

Ez dinêrim ev nesaxiya hikûmeta me ya niha, ji vir tê. Kurd şiyar bûne, nema didin dû melan, nema didin dû eşîran jî. Bûne yek, bûne milet. Dijminatiya nava wan bûye biratî.  Berê ku min li rewşa miletê kurd dinêrî tim ev çîroka dîrokî dihate bîra min. Çîrok wiha ye: Dibê li welatekî mişkên cerboh miselet bûbûn. Zad û dexl bi wan ve nehiştibûn. Hakim aciz mabû. Sofiyek tê ji hakim re dibêje ez karim van mişkan biqeliînim. Hakim dibê, de her kuro, tê çawa biqeliînî? Sofî dibê yabo min tu pere ji te navê, tiştê heye qefesek hesinî mezin ji min re çêke û bila gundî, mişkan bi saxî bigrin bînin bifroşin te. Em ê wan bi saxî têxin qefesê. Qefesek hûrçavik çêdibe, sofî hezar mişkî dixe hundirê wê û derî li wan digire. Rojekê diduyan, sisiyan mişk birçî dibin, dest bi xwarina hev dikin. Pêşî yên biçûk, yên        pîr û nexweş tên xwarin. Hin bi hin mişk kêm dibin.

Carina sofî piçek xwarin davêje nav wan, mişk li hewa hiltînin. Lê wextek tê ku mişk nema xwarina ji derve tê dixwin, lê ku sofî mişkekî ji derve dikuje û davêje nav wan bi carekê xwe davêjinê û dixwin. Sofî dinêre ku mişk elimîn xwarina goştên hev, devê qefesê vedike, ji hezar mişkî 40-50 mane, lê ketine tebîtê pisîkan, bi carekê dikevin nav bajêr.  Mişkên mayîn ji wan narevin, dibên qey mişk in, lê ew bi tebîet bûne pisîk û bi vî awayî dikevin nav mişkên bajêr bi carekê diqeliînin. Çiqas ez xeyala xwe didim dîroka kurdan, ji dema xelîfên Emewiyan, Ebasiyan, Selçûkî û Osmaniyan tim ev dek li kurdan kirine. Em elimandibûn xwarina hev. Weke min li jorê jî got acizbûna tirk, ereb û eceman ev e, ku em nema hev du dixwin.

## Rojeva Eyşo




rusen.sarili@gmail.com

Êrîşên li dijî DTP'ê




Tehemûlî dengê azad nakin




Tolhildana Erdogan




## Miho û pira hesinî

PÊKENÎ

Berî ku dinya bi pêş bikeve, çandinî bi keda milan bû. Paleyî, cotkarî û sewalvanî bi tevayî di ber lepên mirovan de derbas dibû. Bi sihara sibê re tu kes li nava gund nedima. Kesê ku destê wî dar bigirta, derdiket nava zeviyê û karê çandinyê dikir. Miho jî cotkar  bû.

Di wê demê de dewlet nedihat heremê. Tu kar û xizmet ji bo herema Kurdistanê nedikirin.

Vê taliyê nizanim çawa şaş bûn hatin li gundê Miho pirek çêkirin. Pira hesinî hate avakirin, lê pisgirêk ew e ku wê kî di ser pirê re derbasî wê hêla çem bibe. Ez û hevalekî xwe, em li ser pirê rûniştibûn. Min dî Miho cotek gayên cot di pêşiya wî de ji cot tê. Şal û şapik li bejna wî, cotek çaroxê gemarî di piyê wî de, saqoyê xwe kişandiye ser şerwal, haletê xwe daniye ser millê xwe. Hat nêzîkayî li me kir, gihîşte nêzîkî pirê şopa gayên xwe guhert. Bi qasî bîst gava nêzîkî pirê, li kêleka çem rûnişt, saqoyê xwe û çarox û gorê xwe ji piyê xwe kir, haletê xwe danî ser milê xwe û da nav avê. Derbasî hêla çem ya din bû. Careke dî rûnişt; şerwalê xwe zuha kir çarox û gorê xwe xiste piyê xwe û halet danî ser millê xwe. Min deng dayê: Miho ji bo çi te ewqas zehmetî da xwe, te li çem da, ma ne va ye pir heye?

Miho got: Ma ew pira ji boyî min hatiye çêkirin?

Min got: Lê ma ji bo kê hatiye çêkirin?

Miho got: Ew pir ne ji bo min e, ew ji bo TIRIMPÊLAN (ereba) e?

Dixwazin cîhanê bi şer bi rê ve bibin




Şerxwaz ji kuştinê têr nabin






Dr. DILGEŞ
dilges_dilges@hotmail.com

## Çerixandinên bêmantiqî

Gelî dost û hevalên vî quncikî, gelî hezkirî û dildarên du peyvên kurmancî; Azadiya Welat mehekê kete ber xezeba sewciyên dewletê, ji ber wê jî heta mehekê em ê di Rojevê de rojeva xwe bikelînin.

Van rojan, ji tirsa serdegirtinê her çend ez 'seyar' û 'her şev mêvanê malekê' bim jî, (Bawer nekin; daweta mîran gir ketiye feqîran; ya min jî ew mesele ye) dîsa we ji bîra xwe nabim û devê kîsikê xwe li ber we vedikim û hewl didim çend name û e-nameyên we bixwînim û bersivekê pê re bigihînim. Helbet spasdarê we me...

Dostên hêja; Tirsa min ne ez im, heke bême girtin ditirsim ji ber name û e-nameyan serê we jî tevî min bikeve belayê.

-Derveyî mijarê, vê tirsê serhatiyeke xweş anî bîra min. Rojekê melayekî digirin; hindî îşkenceyê lêdikin, mela jî hawara dibe Şêx Ebdulqadirê Geylanî. Polîs di girtenameyê de wiha dinivîse: Li gundê Geylanê di bin serokatiya Şêxo û Ebdulqadir de mela faaliyetên neqanûnî bi rêk xistine û û...

Jê dûr nîn e; Kî dizane belkî sewcî û hakimên dewletê ji bo me jî îdianayeke wisa binivîse û wan nameyan wek delîl nîşan bidin û di wê şemaya ku her roj di kanala tvyekê de digere, rol û misyonekê ji me re jî diyar bike.

Îdianameya muhtemel dê wisa be: Di ser quncikê Azadiya Welat re bi kod û şîfreyan bi hev re çalakî rêk xistine. Di bin serkêşiya Dr Dilgeş de xwedanên name û mailan talîmatên rêxistina Dînan bi cih anîne û û û...

(Çi parayonayeke ecêb e ne wisa! Nebêjin nabe; ev der TC ye, her tişt mimkûn e)

Gelî xwîneran, name û e-nameyên we kê dizanî dê rojekê serê we bixwin. Ji min gelek piştrast nebin, ez ê bêjim, ez serokê komisyona dînan im û ev kesên xwedanê name û e-nameyan jî giş endam û elemanên min in (Bijî neçakî ha ha)

Dostên min, dilê xwe negirin; ev ên jorî giş çerixandinên bêmantiqî ne. Tenê min gotin piçekî çerixandiye.

Jixwe modeya vê heyamê 'çerixandin' e, kî devê xwe veke erd û asîmanan diçerixîne û heww.

Bi kurt û kurmancî, tîr heta ji kevanê nefiryayî 'bêzirar' e, gava firya miheqeq dê li bin guhê yekê bikeve; vêca çerixandinên giştî û yên taybetî jî wisa ne û piranî dûrî aqil û mantalîteya mirovî ne.

Binêrin, gava hakemê futbolê çawa bi fîtikê dide û biryarê pê dide ku penaltî ye û karta sor li nav çavên fulbolbazî dide, hemû leyîzker lê berhev dibin, xwe li erd û asîmanan didin lê dîsa jî 'qerar û biryar'a hakemî naguhere; çawa ew 'îtiraz û çerixandin' bêfêde be jî, ligel ku hemû leyîzker vê baş dizanin û her cara tê serê wan dîsa xwe dixwin lê tiştek naguhere jî, em û tirko û edaleta wan jî wisa ne.

Ew çend biçerixînin 'qerara me naguhere' yanî, çerixandina wan bêmantiqî ye. (Ez çi xweş axivîm ne wisa; kesîn, DTPyî bibihîzin –heke bixwînin tabî- vê carê dê min bikin belediye başqen adayî)

Lê hûn dîsa 'bêmantiqiya xwe' dewam bikin û bi rêya mail, name û hwd derdê xwe bi me re parve bikin.

Dewlet 'karta sor' bide jî hûn îtiraza xwe dewam bikin, heta rojekê derfet bikeve destê we û gogê têkin qeleyê; efû nekin ha… (Her bijî gooollll!)

De hadê, têm çavên we))

**Dilgeşnotek:** Gelî dostên hêja; li Kurdistanê demsala pincarî dest pê kiriye. Ji bo pircarçîneka azad û serbest hûn jî tevlî kampanyaya pincançinê bibin û li dijî operasyonan herin pincêr!..

www.arsivakurdi.org

ROJEV
20 Nîsan 2009 Hejmar:5 Sal: 1

ROJEV
Zin Basın Yayın
İmtiyaz Sahibi ve Sorumlu
Yazı İşleri Müdürü
Cesur YILMAZ
Adres:
Şehit Muhtar Mahallesi
Yoğurtçu Faik Sokak No:12/2
Beyoğlu - İstanbul
TEL: 0 (212) 253 93 34
Fax: 0 (212) 244 06 52
Baskı (ÇAP):
Stenbol: Gün Matbaacılık,
Reklam, Film, Basım, Yayın,
Tan. San. Tic. Ltd. Şti.
Beşyol Mah. Akasya Sok. No: 23/A
Sefaköy - Küçükçekmece / İstanbul
Tel: 0 (212) 580 63 80
Edene: Arslan Güneydoğu
Gazetecilik,
Matbaacılık, Kağıtcılık A.Ş
İstîklal mah. İstîklal. Cad.
No: 44 Seyhan
Edene
Yayın Türü: Süreli



# Nihêla Geverê ziwa dibe

**Bendavên ku li Kurdistanê têne çêkirin zirareke mezin didin xwezayê. Li Geverê ji ber bendava Dîlîmliyê qamişgeha Nihêlê ku gelek giyanewer tê de dijîn her diçe ziwa dibe**

Qamişgeha Nihêla ya navçeya Gevera Colemêrgê ji ber cuhên drenajê yên bendava Dîlîmliyê bi ziwabûnê re rû bi rû ye. Heke tedbîr neyên girtin bi hezaran giyanewarên ku li qamişgehê dijîn dê tune bibin.

Bi taybetî di demên dawî de ji ber bendavên ku têne çêkirin ava qamişgehê her diçe kêm dibe. Gelek deverên qamişgehê jî ji niha ve ziwa bûye. Komeleya Xwezayê ya Colemêrgê ji bo xilaskirina qamişgehê xebat da destpêkirin. Endezyarên zîraetê yên navçeyê jî xwestin ku di demeke kin de tedbîr bên girtin.

Endezyarê Zîraetê Necîp Ok diyar kir ku di demeke ku hişkesalî tê jiyîn de ziwabûna qamişgehê pirsgirêkeke pir girîng e. Ok got ku bi hişkesaliyê qîmeta cihên avî bêhtir tê zanîn. Mirov ji nû ve bi qîmeta cihên wisa dihesin. Ok diyar kir ku ji çarî yek nifûsa cîhanê avê pir kêm dibîne û wiha axivî: "Qamişgeha Nihêlê bi peymanên navneteweyî ve hatiye parastin. Lê ji ber proje û polîtîkayên şaş ji bo hikûmet û siyasetmedaran bûye qada rantê. Qamişgeha Nihêlê weke bihuşta çûkan bû û ji bo çûkên koçber jî qadeke girîng bû. Midûriyeta Herêmî ya Karên Avê ya Dewletê li vir ji bo bendava Dîlîmliyê xebata drenajê da destpêkirin. Ji ber vê yekê jî ava vir pir kêm bûye û ziwa bûye. Her wiha sewalkariyê jî zirareke mezin dîtiye. Nexweşiyên sewalan zêde bûn." Ok diyar kir ku divê ji bo qamişgeha Nihêlê di demeke kin de tedbîr bên girtin û rayedar bikevin nava hewldanan.

**Deşta Geverê ziwa dibe**

Endezyarê Zîraetê Ridvan Yîgît jî diyar kir ku di sala 1993'an de ji aliyê Karên Avê yên Dewletê (DSÎ) ve bendava Dîlîmliyê hatiye çêkirin û ji ber vê yekê jî qamişgeh ziwa bûye.

Yîgît got ku bendav qaşo ji bo avdaniyê hate çêkirin lê cihên avî jî bi ziwabûnê re rû bi rû mane. Bi xebatên drenajê ava qamişgeha Nihêlê jî digihînin ava çem. Yîgît di berdewama axaftina xwe de wiha got: "Bi vê pêkanînê deşt her diçe ziwa dibe. Sîstema drenajê ku heta gotin dê ji bo gundan qada çandiniyê vebike zirarê dide. Gever her diçe ziwa dibe. Bi taybetî jî deşta Geverê di salên dawî de her diçe ziwa dibe. Ax ditebiqe û nebatên bi strî li deştê zêde dibin. Her wiha ahenga xwezayê ya bi hezaran salan xira bûye. Sewal nikarin ava vexwarinê bibînin, nexweşiyên sewalan pir zêde bûne. Ev yek hemû ji bo mirovên herêmê pirsgirêkên girîng in."

Di vê navberê de Komeleya Xwezayê ya Cîlo jî ji bo ku qamişgeh bê parastin projeyek amade kir û serî li saziyên têkildar da. Serokê Komeleyê Sabahattîn Sirma diyar kir ji bo parastina qamişgehê çi pêwîst bike dê bê kirin. COLEMÊRG



## Pîvaz dermanê her tiştî ye

Gelo ma di nav kurdan de, kesên pîvazê nas neke û neçandiye heye? Ez di wê baweriyê de me ku her kurdek bi qasî min pîvazê nas dike. Gelek miletên ku kurdan nas dikin ji pîvazê re dibên "Sêva kurdan". Li cem me kurdan pîvaz dermanê hemû derdan û tamxweşkera hemû xwarinan e. Lewre ez ê danasînê bi serpêhatiyek ser pîvazê, bi we re parve bikim.

Tê gotin ku rojekê kurdek di riyekê de diçe, dibîne ku kesek li ser rê mirî ye. Li tûrikê wî dinêre, dibîne ku di tûrê wî de nan û pîvaz heye. Yê kurd diponije û xwe bi xwe dibê: "Nan pir e û pîvaz pir e, ev mirov çima miriye?"

Pîvaz, ji aliyê medeniyetên kevnar ên wek Sûmer, Med, Asûr, Babîl, Ûrartû Misrî, Hindî û Çîniyan ve, hem ji bo xwarinê, hem jî ji bo derman (xasma ji bo antîbîotik) dihat bikaranîn. Lewre di dema fîrewûnan de, dema pîramîd didan çêkirin, ji bo ku nexweşiya kesên dixebitin nepişke hev, pîvaz bi wan didan xwarin. Heta Misriyan, pîvaza hişk wek sîmga gerdûnê dipejirandin.

Welatê pîvazê ji Îran, Kurdistan, rojavayê Asyayê, Hindistan û heta bi Filistînê berfireh e. Lê kengî hatiye Tirkiyeyê nayê zanîn.

Berî her tiştî antîbiyotîkeke xweristî ye. Allin, propanthialoksid, rûnên firek (yên dibin gaz û difirin) alîîcin, paktîn, însulin, pfosfort, îyot, kûkûrt, sansene, niacin, flafonol, şekir, esansên antîbiyotîk, asin vîtamîn A- B1- B2- C- P.

Li gorî lêkolîn û gotinên pisporan, ji bo ji madeyên di nav pîvazê de fayde bê girtin; hewceye pîvaz bi xavî bê xwarin. Her wiha li gor lêkolînan hatiye aşkerakirin, di kesên ku rojê 3 gr pîvaza taze (hêşin) dixwin de ji sedî 70 penceşêra prostatê, ji yên nexwin kêmtir e. Di eynî mixtara sîr xwarinê de jî sedî 53 kêm dibe.

**Ji çi baş e?**

Tê gotin ku pîvaz ji bo wan nexweşiyan baş e: "Destavê xweş dike. Av û madeyên bêwec ji bedenê tavêje der. Feydekî mezin dide bawîbûnê, vekirina edavên mavsalan, xetimîn û hişkbûnên jiyan (tamaran) û riyên destavê. Ji bo xistina xîz (qûm), kevirên (ber) nava gurçikan dibe alîkar. Êşa gurçikan kêm dike. Westiyana hiş (zêhn) kêm dike. Bêhişbûnê dibûrîne. Pêşiya nexweşiya prostatê digire. Ji bo nexweşiya agzema û nexweşiyên din yên çerm bi kêrhatî ye. Ji bo astim, bronşît, zekem û hemî nexweşiyên ji sermayê tên bandoreke gelek baş nîşan dide. Şekirê xwînê dadixe. Ji bo kolera û êşa zirav (werem) ê bi kêrhatî ye. Kalbûnê derengî dixe. Iştahê vedike. Dil bi hêz dike. Ji bo avêtina edavan (kurmîbûnan - iltihab) dibe alîkar. AMED

*(Ji lêkolîna Bavê Jîndar)*

## Komeleya Fêkî û Sebzeyan hate vekirin

Li navçeya Gevera Colemêrgê Komeleya Sebze û Fêkiyan hate vekirin. Serokê DTP'a Geverê Arîf Kerey, Şaredara Geverê Rûken Yetîşkîn, Şaredarê berê yê Colemêrgê Salîh Yildiz, Serokê Odeya Esnafên Geverê Îrfan Sari, Serokê Odeya Bazirganiyê Sabîh Kayhan, endamên Meclîsa Şaredariyê û gelek kes beşdarî merasîma vekirinê ya komeleyê bûn. Serokê Komeleyê Omer Çîftçî di merasîmê de axivî û got ku armanca wan xizmeta bi qalîte û erzan e. Şaredara Geverê Rûken Yetîşkîn û Serokê Odeya Esnafan Îrfan Sari jî di merasîmê de axivîn û diyar kirin ku dê bi her awayî piştgiriyê bidin komeleyê. COLEMÊRG

## Li Colemêrgê eleqeya semawera sêlê

Li Colemêrgê bi hatina biharê welatiyan dest bi derketina geştê kir. Di geştên colemêrgiyan de jî tişta herî zêde derdikeve pêş semawera sêlê ye ku herî zêde kêrî karê kesên van semaweran çêdikin hat.

Li Colemêrgê piştî derbasbûna sermayê bi hatina biharê re welatiyan dest bi geştê kir. Bi taybetî dawiya hefteyê deverên geştê ji mirovan tijî dibin. Di geştên colemêrgiyan de jî herî zêde semawerên ji sêlê hatine çêkirin ên çayê derdikevin pêş. Welatiyên ji bo bêhna xwe vedin diçin qadên geştê berê her tiştî agir pêdixin û bi semawer çayê çêdikin. Eleqeya semawer a colemêrgiyan jî herî zêde bi kêrî karê kesên semaweran çêdikin, hat. Dikanên li Kolana Kayacan semaweran çêdikin ji ber firotinê keyfxweş in. Dikandaran diyar kirin ku piştî mehan cardin dest bi firotina semaweran kirin. Bavê 2 zarokan Azîz Er diyar kir ku bi salan e bi vî karî debara malbata xwe dike û piştî demsala zivisanê bi hatina biharê karê wî baştir bûye.

**Kar zêde bû**

Mevlan Tekçî jî daxuyand ku ji ber krîza aborî zehmetiyên mezin dikişînin û wiha got: "Hemwelatî ji ber xizaniyê pêrîşan bûne. Lê caran wisa kar baş dibin. Bi germbûna hewa hemwelatî derdikevin geştê. Vê yekê jî karê mezin baştir kir. Hemwelatî sparîşan didin ji bo semaweran. Karê me li gorî mehên borî gelek baştir e." COLEMÊRG



## Şînahî bandoreke erênî li zarokan dike

Di encama lêkolîneke nû de derket holê ku keskahî, dar û şînahî bandoreke yekser li geşbûn û zindîbûna zarokan dike.

Di vê lêkolînê de hatiye zanîn, ku berovajî vê, dema ku zarok tenê di malê de girtî bimînin, bandoreke xirab li ser derûnî û tenduristiya wan dike.

Di vê lêkolînê de diyar bûye ku keskahî û baxçe bandoreke baş û erênî li ser zindîbûna fizîka zarokan dike. Dihêle ku zindîbûneke bi tendurist û saxlem çêbibe û karîna zarokan ya hizrîneke fireh pêş dixe.

Li gorî lêkolînên zanyaran, ew malên ku li derdora wan bax û dar hene zarokên wan derdoran kêmtir rastî nexweşiyan dibin, lê yên ku li herêmeke teng û bêdar û bax de dijîn, zarokên wan cihên teng zêdetir rastî nexweşiyên cûr bi cûr dibin. QAHÎRE